ولكنّنا إذا ما ربطنا السياسة بالعلم كما هو معترف به عالمياً، سنتعثّر بعقبةٍ يعيشها الإنسان الكردي الآن في أحد أجزاء كردستان (كردستان سوريا)، وهي إصدار "الإدارة الذاتيّة الديمقراطيّة" المسيطرة قراراً بتعميم، اللغة الكرديّة، على مناهج التعليم في مدارس المناطق الكردية للمرحلة الابتدائيّة في صفوفه الثلاث الأولى لمواده الرئيسيّة، في ظلّ الظروف المتوتّرة غير المستقرّة أمنياً وسياسياً. هذا بالإضافة إلى فرضها كادراً تدريسياً غير مختصٍّ وتدريبه لمدّة لا تتجاوز ستّة أشهر، دون أن تتلى بأيّ تصريح عن هذه الخطّة التعليميّة غير الواضحة المعالم ومنهجيّتها ومدى فاعليتها وشرعيتها والجدوى.

إلا أنّ هناك أسئلة تؤرّق أولياء الطلاب المنشغلين بضمان مستقبل أولادهم بعد سنوات، والإدارة الذاتيّة الديمقراطيّة معنيّة بالإجابة عنها:

١- ما محل المرحلتين الإعدادية والثانوية من التطبيق، بعد أن يتمّ الطالب المرحلة التعليميّة الأولى (الابتدائيّة) باللغة الكرديّة ؟ ألا يستلزم أن تكون هناك مرحلة جامعيّة متممة لذلك المنهاج الذي بُدأ به؟

٢- ألا ينبغي أن تكون هناك ومعاهد وجامعات إقليمية أو دولية تعترف بهذا المنهاج لقبول الطلبة على مقاعدها وفق اتفاقيات تعليمية؟

٣- من أين استمدّت الإدارة الذاتيّة شرعية وقانونية هذه المناهج إذا ما اعتمدنا بند "ربط السياسة بالعلم" من بنود الأمم المتحدة أساساً لذلك؟

٤- ما مدى قدرات وأهليّة الكادر التدريسي و الذي لا يمكن أن يعمل إلا وفق إيديولوجيّة محدّدة بعيدة كل البعد عمّا ستكون عليه سورية المستقبل؟

٥- كيف ستتصرف وزارة التربية السوريّة إزاء هذه الخطوة، علماً بأنّها أصدرت إنذاراً بالفصل لكلّ المدراء وإغلاق المدارس التي تُدرّس فيها بغير اللغة العربيّة؟ ألا تستلزم هذه الخطوة من الإدارة الذاتيّة توقيع اتفاقيات قانونيّة رسميّة بينها وبين الجهات المخوّلة الأخرى لتحظى بالشرعية والقبول داخليّاً وخارجيّاً؟

٦- ألا يشكّل هذا القرار تهديداً خطيراً على المستقبل التعليمي في المنطقة والذي من شأنه زيادة نزيف الهجرة الكرديّة، الأمر الذي يتربّص به أعداء الكرد؟

٧- في ظلّ هذا التهديد المزدوج من قبل وزارة التربية للدولة السوريّة والإدارة الذاتية، للسلك التعليمي من إداريين ومدرسيّن وجامعيين أكفّاء ذوي الخبرة والاختصاص لسنين عديدة، ألا يشكّل هذا التهديد قطعاً لأرزاق مئات بل ألوف العائلات بهذا الإجراء التعسفي، وليصبح بدوره وسيلةً أخرى لمشروع الهجرة وإفراغ المنطقة؟

٨- إذا ما سلّمنا جدلاً بسريان هذا القرار ورضوخ الأهالي وقبولهم بتطبيقه على أبنائهم، ألن يؤدّي ذلك إلى إنشاء جيلٍ أمّي في المستقبل لعدم اكتسابه الشرعية المجتمعيّة والقانونية؟

إذا أردنا أن ننشئ جيلاً كرديّاً واعياً بلغته وثقافته الكرديّة، لابدّ أن نغلّب العقل على العاطفة في أيّة خطوةٍ نخطوها، بعيداً عن الوطنيّات المصطنعة والشعارات الطنّانة التي لا يطرب لها إلا الطرشان!

وكما أنّ هذه الخطوة التعليميّة التي تقوم بها الإدارة الذاتيّة الديمقراطيّة هي أشبه بحلقات العلم والكتاتيب التي كان يقوم بها الملالي في المساجد، لا بل هي أقلّ قيمةً لأن تلك الحلقات كانت تعتمد على منهجٍ معترفٍ به آنذاك وهو "القرآن الكريم" وإنّ كان المعلّم (الملا)غير جدير أحياناً، أمّا هذا المنهاج المقدّم من قبل الإدارة الذاتيّة لا يُعرف مدى جدواه والفحوى منه، عن طريق كادرٍ تعليميٍّ عديم الأهليّة كالذي يسير في نفقٍ معتّم مجهول المصير !!

هذا بالإضافة إلى فرضها كادراً تدريسياً غير مختص وتدريبه لمدة لا تتجاوز ستة أشهر، دون أن تدلي بأي تصريح عن هذه الخطة التعليمية غير الواضحة المعالم ومنهجيتها ومدى فاعليتها وشرعيتها والجدوى منها، فضلاً عن تهديدها لجميع مدراء المدارس باتّخاذ الإجراءات اللازمة بحقّهم إذا لم يتعاونوا مع الإدارة الذاتيّة بتطبيق هذا القرار .

# المؤسسات الإعلامية في روجافا «رؤية أولية»

## «ميثاق شرف إعلامي ضرورة ملحّة »

إبراهيم بركات

منذ انطلاقة مشروع الإدارة الذاتية الديمقراطية في مقاطعة الجزيرة وعودة التوازن إلى جميع مفاصل الحياة في المقاطعة وخلق مناخات من الحرية الفكرية وكسر حواجز الخوف، وما يعنينا هنا تجليات ذلك في المشهد الثقافي وحراكه العام، وانسحب ذلك على الواقع الإعلامي بكل وسائله وأدواته، إن كان في تنفس الإعلاميين والصحفيين صعداء بعد حالة التغييب والقمع والسطوة الرقابية الأمنية عليهم وعلى أقلامهم نتيجة الذهنية البعثية العفنة وتفكيرها الشمولي منذ أكثر من أربعة عقود، وإن كان في مجال إقلاع وسائل إعلامية عديدة منها مطبوعة ومسموعة على وجه الخصوص، فبدأ تتوالى الصحف والمجلات وكذلك بدأ بث الإذاعات وفي أكثر من مدينة في روجآفا.

يقيناً أن زحمة توالي الإصدارات المطبوعة وبثّ المسموعة «بحالة صحية» مهما بدا مستوى تلك الوسائل متدنية، أو لم ترتق إلى متطلبات المرحلة في مخاطبة المتلقي والقارئ وعجزت إلى حدّ ما في تحفيز المجتمع على الارتقاء بمستوى فكره العام وتطوره المعرفي اللاحق في واقع عانى ما عاناه من الاستبداد والسطوة الأمنية والكبت الفكري ومصادرة الرأي.

في رصدنا لهذا الواقع الإعلامي الجديد وحراكه العام، وانعكاساته على الحالة العامة للمجتمع من جوانبه كافة، نكتشف أكثر من مسألة مهما بدت صغيرة أو مفصلية لكنها في النهاية تعكس الذهنية التي تدير هذه الوسائل وخاصة تلك التي تدّعي الاستقلالية في آراءها وطروحاتها، فهذه الوسائل عجزت حتى الآن في خلق حالة من النهضة الفكرية والمعرفية والذهنية في بنية المجتمع وسياقاته العامة، بل ولم تستطع أن تكون الحامل والحاضن للقيم الفكرية والأخلاقية والاجتماعية في نسيج وبنية المجتمع، يتحكم بها كثير من العادات والموروثات المتخلفة، كونها – أي وسائل الإعلام - تفتقر إلى الكثير من معايير العمل الصحفي المهني والحرفي، ناهيك عن افتقارها إلى كوادر إعلامية تدرك ماهية الإعلام، غايته، ورسالته، وإن وُجدت فمحدودة جداً.

لقد طفى على سطح هذا الواقع الإعلامي الجديد أكثر من حالة فساد وممارسات بعيدة عن القيم الإعلامية والصحفية، وخاصةً في المؤسسات الإذاعية، كونها اعتمدت على التمويل الخارجي – المغتربين – وبإدارة محلية، وكثيراً ما تكون الإدارة مختزلة بشخص ما بعينه، وهذا الشخص لا يمتلك الكفاءة المطلوبة وبعيد كل البعد عن الصحافة والإعلام، ليغدو بين ليلة وضحاها رجل الفكر والإعلام وحاكم تلك المؤسسة التي يديرها، يعيّن ويقصي من يشاء وفق مصلحته الشخصية والولاء له لا للمؤسسة ورسالتها الإعلامية.

فرسالة أيّة وسيلة إعلامية في مخاطبة المتلقي والمستمع والقارئ هي الارتقاء بفكره المعرفي والاجتماعي ومجاراة التطور الحاصل في الفكر البشري والإنساني في منتصف الطريق.

ومن هنا تأتي ضرورة تأطير الواقع الإعلامي بكل جوانبه ووسائله في إطار قانوني ناظم لهذا الحراك وضابط لإيقاعه المتوازن، لا كسيف رقابة مسلط على رقاب أهل القلم.

ومن هنا أيضا حريّ بنا أن نذكر أن اتحاد الإعلام الحر على وشك الانتهاء من التحضيرات لعقد مؤتمره العام الأول، في فترة قريبة قادمة حسب المعلومات المتداولة من إدارة الاتحاد. إن مسؤوليته لا تنحصر في منح الصحفيين والإعلاميين بطاقات تسمح لهم ممارسة العمل الصحفي، وينبغي أن الصحفي المدرك لمسؤولياته ولرسالته الإعلامية الخلاقة ليس بحاجة لمن يمنحه صك شهادة وتعريف، فالبطاقة الصحفية هي تحصيل حاصل للصحفي، ويجب ألا تنحصر مهام الاتحاد في منح الرخص لوسائل الإعلام إيذاناً بمباشرة عملها، بل عليه أن يكون العين الساهرة على:

- حماية الإعلاميين والصحفيين والدفاع عن حقوقهم، وإيجاد فرص العمل لهم بما يتناسب مع قدراتهم الصحفية، والحدّ من ظاهرة تسلّق الجسد الإعلاميّ من قبل بعض الذين لا يمتلكون أيّة مقومات صحفية.
- الإشراف على هيكلة وسائل الإعلام «المقروءة والمرئية والمسموعة» وإصدار القرارات الناظمة لذلك بحيث تتكوّن إدارتها والعاملين فيها من الكوادر المؤهلة.
- مطالبة الهيئات التابعة للمجلس التنفيذي ومؤسسات الإدارة الذاتية الديمقراطية في المقاطعة بضرورة أن تتكوّن مكاتبها الصحفية من الكوادر الصحفية المؤهلة للقيام بمهامها المطلوبة.
- إقامة دورات متخصصة وورشات عمل داخلية وخارجية للصحفيين ذوي الخبرة، لمواكبة كل ما هو جديد في علم الصحافة.
- العمل على إصدار صحيفة دورية للاتحاد.
- للاتحاد شخصية اعتبارية كمؤسسة مستقلة، لذا ينبغي الفصل بين مهامها كجهة تعنى بشؤون الإعلاميين والصحفيين وتتابع قضاياهم، وبين مهامها في منح الرخص لوسائل الإعلام.
- العمل على صياغة ( ميثاق شرف إعلامي ) يكون بمثابة الناظم الأخلاقي والمظلة للإعلاميين ووسائل الإعلام على حدّ سواء. ويكون حافزاً للارتقاء بالحالة الإعلامية في روج آفا ككل، ويكفل حرية العمل الصحفي ضمن أطر أخلاقية داخل أي وسيلة إعلامية.

buyer PRESS
الخبر ... بكل شفافية
www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545

حمدي أسماعيل

١
الواقفون بعيدا
خلف الظلال الكثيفة
عليهم أن يظهروا قليلا
لعبة الاختفاء إن دامت
لن تساعدها ..حتى الذكريات
٢
كل تلك البلاد المنكوبة
التي مثل مركب قديم تترنح
«البحر الهائج تروضه الاشرعة المربوطة
بحبال الصبر»
يقول البحارة
٣
حتى لا يقال أننا
لا نعتبر بالحوادث السابقة
للماضي اللعين ، نعيد قراءة
تلك الخطب الثورية الملهمة
لعريض المنكبين
٤
في شارع الهرم
جلبة التاريخ لا تتوقف
لا نميزهم
أحفاد الملوك
أم عمال مدينة الموتى
٥
القلوب المصرية القديمة
المرسومة فوق معابد الكرنك
ما زالت غضة بارزة
كأنها
كسرت اليوم
٦
الفروع التي لم تكسرها
انتفاضة الطيور الفزعة
ستنتظر
عودة الهاربين
دون مشاجرة
٧
لا أتشائم بالبومة
و لا الغراب الأسود
و لا بثورات النظم العربية
لكن كلمة ديموقراطية

...
٨
اكتفيت
لن أثبت لها حبي
أكثر من ذلك
إن لم تصدقني
فلنذهب معا
إلى الجحيم

## هوزان عنز

لقد أحببنا الثورات في الروايات
حلمنا بها
وبأبطالها
وعندما أتت الثورة بقدميها إلينا
بترنا قدميها
ولطمنا أنفسنا.
***
سأل الطفلُ والده:
متى سننتصر يا أبي؟
نظرَ الأب العجوز إلى أفق الوطن
وقال:
عندما يموتُ الجميع ياولدي..
***
أحرقوا أطفال عامودا في سينماها
صرخَ طفلٌ من درعا
فأحرقوا جميع أطفال الوطن..
الأطفال مكانهم في الجنة
هكذا قالت لي جدتي.
***
الكرديُّ كالجبال في صموده
التقت الجبال
ولم يلتقي الكردي بالكردي.
***
عشرة أعوام ونحن نحلم ببيتٍ
سقفه سماءٌ من حكايات أمّنا
وجدرانهُ ذكرياتنا

لماذا أحبّ عامودا..
ففيها كان ميلاد حبّي.. وفيها
جاءت أبجدية شعري
فكم بذكرها يهفو قلبي وجْداً
ويُعشبُ فقري
أزقتها..أدين بتسكّعي فيها
وتعثّري بين الذّور والحفر
وسرب الصبايا هنا وهناك
يجلّن مشاويرَ بُعيْد العصر
يضئن وجوهاً مع دقّة القدّ
ورجفة الخصر
ترى ما كان هو سرّي
ووراء ماذا في الأزقّة المترية كنت أجري
عامودا لها خصوصيّة تسحرني
فكم كان وصلها إمتاعاً
طيّب النكهة ..مزّاً كما يكون خمري
ومقاهيها سأتذكّرها، وكيف تقاسمتها
مدارس الأحزاب والفكر
ومجانين عامودا ما أروعهم
فكم همْ جديرون بالذّكر
لهم حضورهم ونوادرهم بالحكمة تثري
هم في البال دوماً وأبداً
كيف أصفهم، وبماذا ترى، لست أدري..!
عامودا أيا مدينة المآذن والفقه وبيوتات الذكر
فيك كانت ثورتي الأولى في السياسة وفي
الفكر
وفي الهوى كانت قسمتي منها «مها»
فكم ليلة كنت على موعد معها قرب الجسر
وحدك اخترتك يا مها وارتحلتُ عن فؤادي
كل نساء العصر
سأتذكرهما عامودا ومها، فلولا عامودا
ماكانت مها
ولولاهما لا كان حبّي ولا كان شعري
لن أنسى إذْ تمشط شعرها
وكيف تنساب مذهّبة بين يديّ خصلات
الشعر
وتعكس في عيني مشعّة مرايا النحر والصدر
عامودا أيا مدينة صباي والهوى
ويا حبيبة أمسي وغدي ومدى الدهر
جسدك خريطة كنز وثغرك قبلة ثغري
ونهداك رسالة غرام وقوامك ديوان شعري

بذكرك كم أتباهى وبانتمائي إليك يشمخ
رأسي
فإليك لهفي واشتياقي..
سأقولها في وجع يا مها
أقولها في كل حين في كل عصر
لمّا أحببتك عامودا، لم يكن حينها الدهر
دهري
فرضيت بالهجران قسمة، ولمّا تزل في
ذاكرتي
خارطة القهر
فحبّك سيدتي هو أقرب إلى بسط السلطة
وتغيير هندسة فكري
عامودا، رغم كل ما جرى حبيبتي
بقيت أنتِ المشتهى في هزائمي وفي نصري
عامودا أحببتك..أقولها جهراً
وازدهي شعراً بك ديواني وقصري
ففي حبّ عامودا ساديّ أنا
تراني كيف أستمرئ عذابي ونحري
فمن جافاك عامودا يقيناً هو في خُسرٍ
عامودا أراك اليوم أمامي كما كنتِ بالأمس
فيعمر بالهوى فؤادي وتزدهي برؤاك نفسي
فذاك ديواني ألمحه، وليس بمبعدة عنه
تصطفق ستائر قصري
فأراني وكأني بكسرى في إيوانه
وعلى بساط أخضرَ يختال في مشيته ويسري
وعلى جنباته لم يزلْ يفرد جناحيه
يرفرف مغرّداً نسري
مالها اليوم عامودا
مضرّجة من الحريّة بالمهر..!؟
وفي الساحات أرتال الجموع
تهتف مدويّة بتباشير النّصر
وعلى السراي تخفق الرايات زاهية
بالأخضر.. والأحمر .. والأصفر
و»ازادي» ازدانت بها في المسيرات لافتاتٌ
فباتت نغمة على كلّ شفة
وانشودة على كلّ منبر
فطوبى لعامودا مكلّلة بالغار
ومتوّجةً بالنياشين بكلّ فخر
فعامودا هي الأولى دوما وأبداً
لها الصّدر بأي حدثٍ تطلّ
وفي أي محفلٍ تحلّ
وبأي حينٍ... من الدهر..!

بما تفكر..
قلت!!
بطفل غرق في البحر..
ونجت أحلامه
على أجنحة النوارس..
سألتني !!
وبما تفكر أيضاً..
قلت!!
بموتنا المؤجل
فوق صبارة عطشى
على جذوع الرمل..
سألتني !!
بما تفكر الآن!!
قلت!!
لا شيء ؟
لأنني قوقعة ..
يغتالها المطر

أمام باب مدرستكِ تلاشى الحلم وقادنا القدر
إلى خيمة..!
***
حمل السوريُّ حقيبته فوق ظهره
ووطنه في قلبه
وأبحر..
وقبل أن يصل جسدهُ
إلى الشاطئ
خذلته روحه وبقيت في الأعماق..
***
أيها الوطن
لم يبق الكثير..
ومات الكثير الكثير.
***

محلقين
يخلقون من سحر عطركِ
ألف ربيعٍ وربيع

## لحضورك سحرٌ

/ ضياء الخماسي /

لحضورك سحرٌ يخطفني نحو السماء
حيثُ يتعانق القمران
ويرسمان ظلكِ الوارف بالورد
فوق رصيف قلبي الطويل
ما عدتُ أنتظر الربيع
لقد وخزتكِ بالقلب كالزنبقة البيضاء
وسار ملائكتي بأجنحتهم الى جنان فردوسكِ

## خَوْفٌ

المنجي حسين بنخليفة

في الصغرِ علّمُونا أنّ خلف الدارِ غولاً يأكلُ الأطفال لوْ يومًا تأخّرْنا ، و تعلّمْنا بعصًا الأستاذِ أنّ جدولَ الضربِ و الطرحِ لهُ جرحٌ و الامٌ عميقةٌ . قال شيخُ المسجدِ : الويلُ لمنْ انحرفتْ به يومًا خُطاهُ ، في جهنمَ ثعابينٌ بأشكالٍ مُخيفةٍ ...وكبرْتُ ، كبُرَ الخوفُ معي ، همسَ يومًا في أذُني أستاذٌ علّمني حروفاً في الصغرِ :
ـ أنتَ صاحبُ فصاحةٍ ، وثقافةٍ ، و قلمٍ لهُ حرفٌ جميلٌ ، فلماذا لا تخطُّ لنا أدبًا يزيدُنا فهمًا ، وعلمًا ؟.
في المساءِ سكنَ الكونُ ، مسكتُ وريقات وقلمَ رصاصٍ ، و بدأتُ في القصيدِ:
يا وطني...
صرخَ في داخلي صوتُ شرطيّ غليظٍ :
ـ يا هذا ، هل تستجيرُ بالوطنِ منّا ؟ هل نحنُ ظالمُونَ ؟.
مسحتُها، وكتبتُ :
يا حبيبتي...
صرخَ في داخلي شيخُ مسجدِنا :
ـ حرامٌ عليكَ كلامُ الغرامِ .
مسحتُها ، و كتبتُ :
يا أنا ...
صرخَ الكلُّ بصوتٍ واحدٍ :
منْ أنتَ ؟ أنتَ شيءٌ تافهٌ في هذه البلادِ ، أنتَ صرخةٌ ضاعَ صداها في عمقِ وادٍ، أنتَ لا تاريخٌ تحملهُ ، ولا حاضرٌ تبْنيهِ ، ولا مستقبلٌ ترْنُو إليه ، أنتَ كُتْلةٌ من خوفٍ ، خُلِقتْ كيْ لا تكُونَ ...

---

## اللعب مع الكبار

رجاء بقالي

راقص الزمن العقارب في دورتها العكسية ،
و توارى بلهو
بميلاد ذلك الوليد
العجور .. لم يفارقه لحظة و هو يكبر / يصغر
إلى الأربعين ، و
هاهو يقهقه
إذ يراه يموت رضيعًا بين يدى زوجته
الهرمتين ..
ألقى بالقصة جانبًا و ارتمى على السرير
المنهك ..
أطلق زغرودة ميلاده في الخمسين ، و راح
يركض إلى ما قبل
البداية
ليصنع حكاية غير الحكاية ..
امتدت الطريق مسالك من دم و رفات و أنات
.. تعثّر بإهاناتٍ
زوجته و سخرية
أقاربه .. على كومة رمل تناثرت أوراق
روايته التي لم تعرف
النور أبدًا ..
حبًا و حبًا يشده التوق إلى صرخة ميلاد
جديدة ..
مدت إليه حبلًا من شعاع و اختفت ،
أمه التي لن تلده مرتين ...

---

## كابوس

إيمان السيد

توقّفتُ عقاربُ السّاعة بغتةً
اتّكأ على حائط ظلّه
وحدها مربّعات الشّطرنج من تعرف كُنْه
الملك ، فترثيه
نبذوه وحيداً في اليمّ غرقتْ سفينته في لجّة
البحرِ مودّعةً نور
الشّمس
على حافةِ كابوسٍ كان يظنّه عمراً من ألوان
..

## وحشة

### جزيرا بوطان شعريا

زاوية يكتبها: طه خليل

لو أن بلدة أخرى غير «جزيرا بوطان» انتفضت لامتشق الكتاب « الكورد « أقلامهم واستشعروا لها وبها، ولو أن أطفالاً أخرين غير أولاد منجي، وبريخاني وسينمى استشهدوا على يد جيش جرّار لأصدرت جمعيات حقوق الإنسان « الكوردية» بيانات مدبّجة بكل معاني العطف الإنساني، وأرسلتها إلى بان كي مون ودي مستورا كذلك، ولخرجت مجالس وأحزاب « كوردية « في برلين وباريس لتوزع منشورات باللغة الألمانية والفرنسية منددة بما يحصل، ولو كان المجرم غير الطاغية أردوغان كذلك، لكن المدينة هي « جزيرا بوطان» الكردية.. وليست الكوردية، والمجرم هو أردوغان وجيشه، وتلك الأقلام « الكوردية» والمجالس والمنظمات تعيش في كنف السلطان العثماني، وتُسبّحُ بحمده.
ذات مرة أجريت حواراً « أدبياً « مع « شاعر كوردي» كنت أسأله عن مولده، متى ولد، وكيف درس ومن أين جاء، فكان يَمُطّ الحديث قليلاً ثم يشُطّ به، ليقول لي: « عليكم ـ وكان يشملني بتلك الكاف والميم ـ أن تتوقفوا عن السلاح، أنتم الآبوجيّون لن تحققوا شيئاً من خلال السلاح. عليكم أن تناضلوا سلمياً وديمقراطياً، لقد ولّى زمن الحروب والأسلحة، ثم قل لي بربك ماذا تفعل بندقيتكم الكلاشنيكوف أمام دبابات الأتراك وطائراتهم.. نحن ضعفاء والعدو قويٌ يا هفال طه.. « وكنت كلما أحاول أن أعيد رَسْنَهُ الى حوارنا الأدبيّ، كان الشاعر يتحمّس أكثر ليقول نصائح دايلامية ومهاتما غاندية، وهو يظن أنني مراسلٌ بينه وبين قيادات الأركان العسكريّة عند وحدات الكيريلا في جبال كردستان، وفي المختصر أصر الرجل الشاعر أن يقول رأيه السلمي، ويشجب فكرة الكفاح المسلح عند الأبوجيين.
طبعاً وبعد أن تحدث الشاعر عن طفولته، وكيف أنَّ والده مات بعد مولده بيومين، وكيف تزوج عمه من أمه ( لدى الكرد والكورد أيضا» يتزوج الأخ من زوجة أخيه إن مات الأخ ) وكيف كان عمه أو زوج أمه يضربه حتى هرب من بلاد سرختى.. وجاء الى بلاد بنختى.. ثم صار شاعراً وانتسب لحزب كوردي وهو يشغل مكتبه السياسي، ويكره الأبوجيين، ولم يتسنَّ له أن يدرس إلا في حجرة شيخ مغمور لعدة أشهر ليتعلم بعض الفقه.
وبما أن اللقاء كان مصوراً طلبت منه أن يختم حوارنا « الجهنمي « بقصيدة من قصائده المحببة إلى قلبه، فتنحنح مطولاً.. وفتّش بين صفحات كتاب له كان يسميه ديواناً. وقال لي: سأقرأ قصيدة بعنوان « لا نريد الحرب « فقلت في نفسي « والله الرجل صاحب مبدأ.. سياسياً وشعرياً هو ضد الكفاح المسلح. ولكنه بدأ يقرأ و يقول وباللغة الكردية طبعاً: « نحن لا نريد الحرب/ لكن ماذا نفعل؟/ إن لم نحارب لن يخرج العدو من أرضنا/ ألا يا أيُّها الشاب الكردي والشابة احملوا بنادقكم واتجهوا للجبال/ وليجري الدم حتى الركب/ فلا شيء يحرّر كردستان غير الدم/ وغير فوهة الكلاشنيكوف.»
كنت أنظر إليه.. وتكاد عيني تدمع من وحشة الشاعر المسالم الذي يدعو الأبوجيين لإلقاء السلاح، وحين أتذكر الشاعر هذا.. أعرف تماماً ما تفعله «جزيرا بوطان».. وأعرف أنها ليست ببعيدة عن كوبانى.. وستنتصر سواء دبّجوا لها القصائد أم لا.. هي وحشة الشعراء وليست وحشة الشهداء.!



جديد الشاعر عماد الدين موسى

عن منشورات المتوسط (ميلانو- إيطاليا)، صدرت للشاعر الكردي السوري عماد الدين موسى مجموعته الشعريّة الثالثة، بعنوان (حياتي زورق مثقوب). المجموعة تتألف من ٧٢ صفحة تتوزع على ٢٩ قصيدة نثرية ثلاثة منها بلا عنوان. ويغلب عليها التغني بالطبيعة والذات، والترنم بعذاب الإنسان الضائع الذي يبحث عن مرفأ له في العالم. يقول في قصيدة بعنوان (المرفأ):
«أيتها الموجة..
أيتها الموجة..
التي
ربما
دفعتها الريح لارتكاب هكذا حماقة
ها أنا ذا أغرق
وكذلك أنت
وما من مرفأ».
يعتني عماد بتركيب النص والمقطع الشعري، فاللغة المركبة بشكل مختلف ومختزل، عنصر مهم في بناء القصيدة لديه، لذلك يمكن تسميتها بالقصيدة الماهرة أو الذكية لأنها منحوتة بعناية في زحمة مشهد الشعر اليوم، إنها عناية اشتهر بها عماد في كتبه السابقة وهي سمة ميزت نصوصه كلها تقريباً:
«الفتاة التي تعرج في الحب
الفتاة التي تعرج في
الفتاة التي تعرج
الفتاة التي
الفتاةُ..»
كما يحاول الشاعر الوصول إلى مرافئ مستقرة لنصوص مازالت تعشق الإبحار، ففي الوقت الذي تغرق فيه نصوص اليوم بالسرد والهوامش والابتعاد عن الأعماق، يصر عماد على وضع علامات ضوئية على جزره التي يبحر صوبها في كل سفر أو استكشاف، تلك العلامات تؤكد شغله الدائم على موضوع الاختلاف في النص.. ميزة تظهر بثقة في كل نصوص المجموعة.
الشاعر عماد الدين موسى من مواليد عامودا في سوريا. وقد أسس و رئس تحرير مجلة (أبابيل) المتخصصة بالشعر العربي و العالمي.

---

الكتاب: حياتي زورقٌ مثقوب– شعر
المؤلف: عماد الدين موسى- سورية
الناشر: المتوسط- ميلانو- إيطاليا– ٢٠١٥
الصفحات: ٧٢ صفحة
القطع: المتوسط

Rû5
Taybet
"Rêncber" Hel-bestvanê Mezin Emerê Le'lê Nas Bikin.

Rû4
Cîvak
Kêla Gora Alan Dê Bimîne Nîşana Xewnên Nîveo
Malav Elî

bûyer
Nûçe ... Bi Zelalî
PRESS

Rû3
Hevpeyvîn
Hunermend Se'îd Gabarî

Rû2
Gotar û Lêkolîn
Koçberîya Jî Deverên Kurdî Xizmeta Kê Dike..!?
Ekrem Sebrî*

www.buyerpress.com buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com WhatsApp 00905368908545

Rojnameyek Sîyasî - Civakî - Çandî - Serbixwe - Nîvmehane
2
Hejmar /27/ 15-9-2015 Buhayî PS 50


# Ezê mala xwe bifroşim

# Bidim dûv sekretêrê xwe



## Yê li Welat :

Xwezî çûk bim mi pê danya
Li ser xaka te Almanya
"Iqamet" min bi destxista
Mi zarokên xwe zû banya

Xwezî çûk bim bi wîzwîzê
Li min nebhûre payîzê
Li Berlîn bim, li Tirkî yan
Bi kêmanî li Domîzê

Jiyan bû zeqnebûta sek
Buhayî em kirin parsek
Bi şev hawin "Selamat" in
" Siba te b' xêr " şer û fîşek

Ne av û kehreba mane
Ne mazot û ne jî nan e
Ne bûn " Ehlêşikeftê " lê
Sehê ber dergehê wan e

Mirov ma yê herî erzan
Li sûka gend û bê'erzan
Niza kîjan seet yan roj
Mirin wê dakeve j' ezman

Ne Arnold im ne Rambo me
Ne Necmeddîn û Şêrko me
Hezar artêş li vir çêbûn
Li ser pişta mi tev kom e

Nebûna paşeroj û kar
Welat valakirî yek car
Ji ber " Erkê xweparastin"
Ciwan bûn zîbeqa ferrar

"Ebû Hafiz" bi devlalî
Çi got û wek xwe kir talî
Bi fermana "Qum" û " Mosko"
Ku sed sal din ez im walî

Nivişta devgirêdanê
Ewî çêkir li Tehranê
Ji bo Pûtîn û Obama
Nebin ser êş li meydanê

Bira qaçaxçiyo wer vir
Mi bib wek kû te "çîko" bir
Belê helbet ku çend yoro
Ji bo min t'ê bidî xatir

Ezê barkim herim hêla
Xuh û dayka xwe Ancêla
Xwe b'avêjim bej û derya
Tevî noqbûn û xartêla

Jinik pabendî mêrê xwe
Wisa lawir bi şêrê xwe
Ezê mala xwe bifroşim
Bidim dûv sekretêrê xwe

## Yê li Almanya :

Ji roja min welat hiştî
Dilê min bûye nîv kuştî
Li gel kû ez ji her tiştî
Bi parim, bê fiyat im ez

Li Kurdistan kewê boz im
Mij û moran û bahoz im
Çiya û ar û Newroz im
Bi dil Dicle û Ferat im ez

Ne zistan min dirazîne
Ne havîn kelkel û tîne
Xerîbî min dixapîne
Dibêje : nîv welat im ez

Şefeq ka dengê şalûran
Şivanên berx û gergûran
Kilorê nanê tennûran
Dema kû ser liqat im ez

Li Qamişlo , li Dirbêsyê
Li Amûdê û Serêkanyê
Li Kellasê û li Salihyê
Bi dost û zikreyat im ez

Bi qurban bim Cezîra min
Heta mirnê li bîra min
Li "Kafê Net" be, pîra min
Li ser Facebook û chat im ez

Birano hûn nebin koçber
[Nebî j ' we kes were vê der
Biyanî bê bin û bê ser
Ji lewra bê tebat im ez

Kurê şoreşger im wek pêt
Pizot min va ji poz avêt
Li ser mobayl û internêt
Şev û rojê xebat im ez

Dijî vê komela zorker
Ku cem xelkê xwe kir qeşmer
Li Berlîn û li Hanover
Çi pêşandan li kat im ez

Beşaro wek te ez dîn im
Kesî l' pêşya xwe nabînim
Bi ( postan ) ez te dişkînim
Ji bo te kiş û mat im ez

Siyah bextê me çû l' vî ket
Jimara gel li nîvî ket
Çi cara çav li tî vî ket
Ji bo we dilşewat im ez

Gelê min, hemberê wî be
Bela wî j' bin serê wî be
Hema şoreş bi dawî be
Li bendî min be, hatim ez

**Ibrahîm Xelîl**

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

# Hemû Werin Ewrupayê Werin Em Bi Hev Re Vê Tirşikê Bixwin

"Werin bavê min werin, erd û mal û milkên xwe hemuyî bifroşin xerîban û zû werin. Ji bilî şerefê, her tişt li vir heye .Werin, tirşik li ser agir e, jê bêpar nemînin".

Helîm Yûsiv

Ji berî çend salan ve, ji 2011an û vir de, min tim ji xwe re digot; em çi nifşekî bêşens bûn. Xwezî di dema ciwaniya me ya li welêt de û berî em derbider bibin, ev guhertin çêbibûna. Min jî wekî xortekî nûhatî karîbûya li qêrîna ji bo rûmetê, meşa ji bo azadiyê û bêhnkirina kulîlkên wê yên ku hêdî hêdî li seranserê Sûriyê vedibin, kela dilê xwe hênik bikim. Lê, ev bextewerî nebû para min û kesên mîna min ku me, di qonaxa bêdengî û tirsê de, li welatê xwe yê madtirş û rûzerbûyî, çiyayên bêhêvîbûnê li pey xwe hiştin û me berê xwe da aramî û xweşikiya welatê xelkê. Min xweziya xwe bi rewşa wan xortên ku bêtirs daketin kolanan û ew bêdengiya bi dehên salan li pey xwe hiştin tanî. Xwesteka vegera welêt û beşdariya di vê meşa bi rûmet ya çûna ber bi azadiyê ve bibû mijara rojane. Hîn danûstendinên me bi dawî nebibûn, mesele weha lê hat ku piraniya wan xortên me xweziya xwe bi halê wan tanî û me ew xwedî şens didîtin, ku dîrokê derfeteke weha kiriye para wan, dev ji welêt berdan û ketin ser riya Ewrupayê. Roj bi roj pêla koçberiyê gurtir û berfirehtir bû û her kesî êdî xweziya xwe bi halê me koçberên Kevin anî, ku em xwedî şensekî mezin bûn û em li Ewrupayê bûne xwedî pasaport, me xwe zû ji nav agir xelas kiriye û em bûne nîştecihên vê bihuşta ku niha bûye xewna her kesî.

Li şûna ku me dilê xwe dibijand derfeta ku ketibû destê wan, êdî ew dilê xwe dibijînin vê derfeta ku ji zû de ketiye dest me û em di nav bax û bustanên cinneta baqî de mane û kêf kêfa me ye.

Ya herî xerab jî ew e, kîjan kesê ji zû ve li Ewrupayê bi cih bûye behsa aliyên xerab yê koçberiyê bike, yekser bi vê besivê tê pêşwazîkirin; eger tu rast dibêjî were tu û zarokên xwe vegerin. Yan jî te cihê xwe li Ewrupayê xweş kiriye û tu ji me re dibêjî neyên vir. Bi vî awayî, ku ez jî yek ji wan im, bi sedan kesên ku li Ewrupayê dimînin heta roja îro ji kesekî din re negotine ku neyê vê derê. Berevajî wê, li Elmanyayê tenê bi hezaran xelkê malbat û xizmên xwe anîn û ji bo hatina wan bûne alîkar.

Ez bi xwe heta niha nebûme alîkarê hatina yek kesî, ne ji malbatê û ne jî ji derveyî malbatê, lê wisa jî di pêşiya hatina ti kesî de nebûme û nabim kelem. Ji ber vê, kî dixwaze bê Elmanyayê bela bê û bi me re beşdarî xwarina vê tirşika ku bi salane em dixwin, bibe. Tirşika bêrûmetiyê, tirşika zuhabûna giyanî, tirşika parsa bi navê qanûnê, tirşika qijak an qiralka ku dixwest bibe kew, tirşika koletiyeke modern, tirşika jiyana bi keda xelkê û berî van hemuyan tirşika koraniya xerîbiyê.

Piştî pazde salan ji derketina min a ji welêt, ji min re hat piştrastkirin ku ew gotinên her gav li ser xerîbiyê li ber guhê min diketin ne tenê silogan û helbestên stiranan bûn. Ew encama serboreyên jiyana hin kesan bû, ku divabû me bi guhekî paqij li wan guhdarî bikra. Kî tê bela bê vê tirşikê bixwe, lê divê jibîr neke ku, di wê kêlîkê de, ya ku mirov welatê xwe li pey xwe dihêle, rûmeta xwe jî li pey xwe dihêle. Gelek ji me ji bo bidestxistina rûmetê berê xwe didin welatên xelkê, lê ji bo mirovê xwedî hest, ew rûmet dibe rewrewk û bi demê re rastiyeke weha tazî tê holê, ku ew jî ev e: Eger mirov li welatê xwe rûmeta xwe bidestnexîne, wê ew rûmet li ti welatekî din bidest nekeve. Dibe Ewrupa li şûna mala ku jidestçûye maleke din bi kirê bidin koçberekî û her meh kirya xaniyê wî bidin.

Lê wê kî wê bêhna axê ya ber deriyê mala wî lê vegerîne? Dibe ku elektirîk carekê jî qut nebe, wisa jî ava germ û sar, lê wê kîjan dê, metik, xaltîk, heval, xal, ap yan jî meriv wê bê bi hewara tenetiya wî ve û rê li ber ronahiya lempeyên dilê wî veke? Dibe ku ji çaraliyên xwe ve mirov bi avahiyên bilind û kolanên paqij dorpêçkirî be, lê wê çawa karibe xwe ji çal û şikeftên hilweşiyayî yên xemgîniyê yên di hundirê xwe de rizgar bike? Dibe ku pereyên navê wan li cem dewletê "alîkariya civakî ye" û li cem penaberan "mi`aş" e her meh bidin, da ku mirov ji birçîbûn û bêperetiyê nemirin.

Lê wê kî wê rûmeta mirov ya ku her kêlîk di bin piyan de ye, lê vegerîne?. Wê kî jiyanê derbasî wî giyanê mirov bike, giyanê mirî, yê çilmisî û hişkbûyî? Dibe ku mirov karibe rengê porê xwe biguhere, lê wê çawa karibe rengê çavên xwe yan jî rengê çermê xwe biguhere? Dibe ku bi şev û roj di nav ronahiyê de be, lê wê çawa karibe xwe ji koraniya ku xerîbî dixîne çavên mirov de xelas bike?. Bi vî awayî pirs xwe dispêre pirsê.

Werin Ewrupayê, hemû werin. Werin vê tirşikê bixwin û mîna min û niha, piştî we pazde bîst sal ji temenê xwe bi xwarina tirşikê derbas kir, xwe ji vereşandinê re amade bikin.

Werin bavê min werin, erd û mal û milkên xwe hemuyî bifroşin xerîban û zû werin.

Ji bilî şerefê, her tişt li vir heye.

Werin, tirşik li ser agir e, jê bêpar nemînin.

# Koçberiya Ji Deverên Kurdî Xizmeta Kê Dike..!?


Ekrem Sebrî*

Koçberî wisa tê naskirin, dema ku mirov bi şêweyekî kesayetî an jî bi şêweyekî komelek ji malbatan, devera daniştiya xwe berde û ber bi welatekî din here û li wî welatî bi cih bibe, hem ji bo demeke kin an jî ji bo demeke dirêj dûrî welatê xwe bikeve, bê guman ev yek ji dûr ve tê naskirin û hejmar li gelek welatan li gor "UN" naskirî ne.

Sedemên koçberiyê jî bi piranî ji ber şer û cengên ku li welatê wan pêk tên, an jî ji sedemên tengayî weke rewşa aborî û zordariya li ser wan ji hêla rejîmên Desthilatdar ve li welatên wan.

Beguman rewşa koçberan li welatên ku lê bi cih bibin, wê were guhertin, ji ber wê bi demê re têkevin rewşeke girêdayî zagonên wî welatî û girêdayî rewşa civakî, ramyarî û aborî, herweha nifşên ku li dûv wan werin, li vir bi piranî dikevin rewşeke ku êdî bi wî welatî ve têne girêdan û nema dikarin vegerin welatê xwe.

Em îro li rewşa Koçberên welatê xwe binerin û li ser rawestin, ku bo me Kurdan êdî pirsgirêkeke mezintire ji koçberiyê, tehlûka wê mezine li ser gelê me û welatê me, ber bi guhertineke dêmografî diçe, lewma dibe cihê xemgîniyê û lêgera çareseriyê.

Sedema sereke ku hate pêş gelê me û kêmasiya tevgera me ya siyasî, sedî sed tê de diyar e û ne veşartî ye, divê merov li ser raweste ka gunehkar kî ye û çima? da mirov bikaribê ronî bike, gelo ev koçberî bi vî rengê tofan di xizmeta kê de ye..!?

Kêşa me ya gelê Kurd di Sûriyê de bêguman siyasî ye, girêdayî welatê bav û kalan e, ku hatiye dagîrkirin li gor hevpeymanên navdewletî weke "Sayks Pîko" Kuridstan di navbera çar dewletan de parçe kirin. Beşê me ku kete bin destê dewleta Surî de, hêla ku pîlanên nijadperestî ji hêla rejîmê ve pêk werin, daku hebûna me weke gel li ser xaka wî tune bikin. Yek ji wan pîlanên gemar ew bû ku ji hêla rêveberê parastina Rejîmê li navçeya Herêma Hasekê amade kiribû ku li gor xwendin û şîroveyên wî bikar bînin, ew jî navê wî Mihemed Teleb Hîlal bû..

Rejîma şofînî bi salan xebat di ber de kir, lê nikarîbû bi cih bîne, tevlî ku beşek ji pîlanê wî bi cih hat, weke "Amara Awerta" sala 1962an ku bihtirî 150 hazarî ji hevwelatiyên Kurd hêlan bê nasname, û ya din jî pîlana Kembera Erebî ku erdên çandiniyê ji gel sitandin û hevwelatiyên Ereb yê bin Ava Furatê li devera bajarê Reqa anîn devera me, ew xaka çandiniyê li wan belav kirin.

Gelê me her bi xaka xwe ve ma girêdayî û koçber nebû, belkî hin kes an malbat koçber bûn, lê pir kêm. Di van her pênc salên dawî de, piştî destpêka Şoreşa gelêrî ya seranserî Surî, ku gelê me jî hêviya serfiraziyê kir, tevlî xwepêşendan û çalakiyên gel bûn.

Li vir mirov kare bêje derfeteke dîrokî bo gelê Kurd hat, eger tevgera wî ya rêzanî karîbane wê derfetê bi dest bixe, lê mixabin û sed carî mixabin ku nikare wê rola ku jê dihate xwestin bike, gelo çima..!?

Di destêkê de xwepêşendan li seranserî welat geş bûn û pêlên wê xurt dibûn, tirseke mezin li ba rêjîmê peyde bû, vêca bi her şêweyekî hewlidanên xwe dikirin, ku rê li ber şoreşê bigire, ew gorînên ku jê dihatin xwestin nedikirin, dema lê teng bû berê xwe da Tevgera Kurdî, ku wan bi ser xwe de bidiyê , da alîkariya Şoreşa Gelêrî nekin û wê pûç bikin. Li vir mirov dikare diyar bike ku rola Tevgera Kurd nekete wê cokê de, ku bikare rola xwe ya ku jê dihate xwestin bike û em gihandin vê dema xirab û rê li ber koçberiya dilêş vekir.

Sedema sereke nakokiyên bê pirsyar di navbera partiyên Tevgera Kurdî de li Sûriyê, ev gunehê dîrokî bo her kesî diyar e, dema ku nikarin li gor mercên demê lihev bikin û nakokiyên wan heya roja îro berdewam in, ev derfet dane koçberiyê bi şêweyekî mezin, ber bi guhertina dêmografî ya welatê me, wêneyên rojane dibine cihê dilêşiya her Kurdekî..

Duwemîn sedem ku dewleta Turkan jê tirs dîtin, ew derfeta ji gelê Kurd re hatî û bûbû cihê hêviyê ku herêmeke azad li devera Rojavayî Kurdistan pêk were, da gelê Kurd li vî parçeyî ji mafê xwe bi dest bixe weke beşê Başûr ji welatê me ku îro xwedî sîstemeke Fediral e di çarçewa dewleta Îraqê de, dewleta Turkiya bi desthilatdariya partiya AKPê bi roleke xirab leyist û alîkariya her şêweyekî kir ku xirabiyê di welatê me de bike, bi teybet alîkariya hêza tirora reş kir, bi her şêweyî rê da wan ku bikaribin serbest herin û werin, çekên xwe û Teroristên xwe ji tevaya cîhanê bînin û derbasî Suriya bikin.

Li vir mirov dikare bêje ku dîroka rejîmên dagîrker li ser her çar parçeyên Kurdistan xwe vegerand, tev de hevalbendên alîkariya hêza Tirorê dikin û dewlata bi navê dewleta Islamî "Da'iş" li Iraqê û Suriya ava kirin, her yek ji wan li gor berjewendiyên xwe piştgîriya wê dikin, tengayîke mezin li ser devera Kurdan pêk anîn, ku rewşa wê ya siyasî, civakî û aborî têk dan, lewma gelê me bê çare ma û li derfetekê digeriya, ku bikare xwe û malbata xwe li welatekî din bi cih bîne û hêviya pêşerojeke aram bo malbata xwe peyde bike. Ev yek şêweyekî cûdatir ji koçberiyê peyde dike, welatê me ber bi guhertineke dêmografî dibe, em ketine rewşa man û nemanê, lewma mirov dikare bêje ku ev koçberî xizmeta rejîmên dagîrker dike, xizmeta siyaseta wanî nijadperest dike.

Bi van şaşiyan herdû Encumenên Kurdî û nakokiyên wan bê pirsyar, derfet dane rejîmên dagîrker ku oxira gelê me ber bi koçberiyê xistin, eger bixwazin derfeta mayî biparêzin, pêwîst e dev ji nakokiyên xwe berdin û li gor hevpeymana Dihokê, destê xwe bidin hev, dev ji ezeziya kesayetî û partîtî berdin, berjewendiyên gelê me deynin ber çavan. Çara herî baş ev e, ku rê li ber pîlanên gemar yên dewletên dagîrker bigirin, eger nekin herdû têk diçin û wê gelê me qurbaniyê dide.

*Endamê Komîta Nawendî Ya Partiya Dêmokrata Kurdî li Sûriya ( Partî)

# Ol û Netew Li Rex Kurdan

Luqman Silêman

Ji ber ku Kurdan beriya herkesî bawerî bi ola tanîn û xwe di ber de didane kuştin, ji her kesî jî bihtir, ji lewma jî em dibînin Kurdê Cihû hene û Kurdê ku mane li ser ola xwe yê ku em ji wan re dibêjin Zerdeştî û Êzidî û Kurdê Misilman û di nav re yê ku bûne Şi'e, Sine, Elewî, Biha'î, û Sabi'a, ev tev jî Kurdîtî li cem wa piştî olê tê.

Ji Rojhilat ta Rojava, ji Bakur ta Başûr miletê diniyayê ol li ba wan hene, di nav wan olan de jî mezheb hene, lê dimîne netew li pêşiya olê, ji lewma jî gelek miletan sûd ji rexê olî kirin. Ol kirin gemî û lê siwar bûn û miletê xwe pê gihandin qefê. Bi kêmayî miletê ku Kurd ji sedê salan ve bi wan re dijîn ji Ereba ta bi Firs û Tirkan, Kurd ji xwe re di rêya olê re bikar tanîn, wek ku li olê siwar hatin li Kurda jî siwar hatin, lê mixabin Kurdan heta îro nekarîbûn xwe ji bin wê bandorê derxin û weka miletê deverê sûdê ji olê bigirin!!.

Kurd her dem ji hemî olê asîmanî û ramanê nû re bûne ardû!. Çi ramanê nû ku hatibûn deverê, Kurdan xwe pê girtiye, lê nikarîne ji bo azadiya miletê xwe ne wê olê û ne jî wî ramanî bixin bin xizmeta berjewendiyên xwe de û pê bighin qefê.

Di Tewratê de hatiye Kurd û Firs hevkarê hev ê îmbiratoriya Mad û Firs bûn, ji xwe wê demê Ereb li deverê peyda nedibûn, lê dema ku Misilmanan berê xwe dan heremên Kurdan piraniya Kurdan xwe li dora olê kirin kom ji bilî beşek hindik yê ku li ola xwe xwedî derketin lê mixabin ew jî bûne armanc ji Kurdên ku bûne Misilman re.

Dema ku Selahdîn Eyûbî Qudis vekir û bû desthilatdarê deverê lê tiştek ji Kurdan re nekir heta îro hin dibêjin ramanê netewî di wê demê de nebûn, lê ew jibîr dikin ku di wê demê de Cengîz Xan û Holako bi navê miletê Mengolî ji Rojhilata nêzîk ta bi Şamê erd vegirtin.

Dema ku miletê Tirk wek êl ji Rojahilata Nêzîk berê xwe dan Rojhilata Navîn Kurdan bi gulê sor pêşwaziya wan kirin, dane pêşiya wan û ta bi Bexdê çûn, di wê navê re jî Kurdê Şi'e û yê Sine di cenga Çaldiranê de berê çekê xwe dane sînga hev, hin ji Firsa re û hin ji Tirkan re hatin bikaranîn. Di vê dîroka dirêj de her Kurd mane li ber deriyê xelkê û ji wan re bûne xulam û rêncber.

Ji ber ku Kurdan beriya herkesî bawerî bi ola tanîn û xwe di ber de didane kuştin, ji her kesî jî bihtir, ji lewma jî em dibînin Kurdê Cihû hene û Kurdê ku mane li ser ola xwe yê ku em ji wan re dibêjin Zerdeştî û Êzidî û Kurdê Misilman û di nav re yê ku bûne Şi'e, Sine, Elewî, Biha'î, û Sabi'a, ev tev jî Kurdîtî li cem wa piştî olê tê.

Kurd di sedê bîstan de, di sala 1937an de Seyîd Riza li Dêrsimê berxwedan kir û di pey wê re miletê Dêrsimê qelenek pir mezin danîn!? Tirka bi hovîtî li Dêsmiya xist û Seyîd Riza Elewî bû lê negot ez Elewî me yan ez Zazî me, lê belê got: Ez Kurd im. Li Kurdistana Îraqê dema ku yekem partî bi navê partî Demukratî Kurdistanî hate avakirn û Elî Ebdilê bû Sikirtêr negot: Ez Filî, wî jî got: Ez Kurd im, û dema ku Mezlûm Doxan dîwarê zindana Amedê hejand negot ez Zazî me yan ez Elewî me, got : Ez Kurd im, û bi sedan lehingê weka van çi Zazî û çi Filî netewa xwe di ser olê re girtin, lê mixabin îro ev mijar roj bi roj wek ji nû ve di nav Kurdan de gur dibe. Îro piraniya Kurdê Elewî Elewîtiya xwe didin pêşiya Kurdtîtiya xwe ji xwe beriya pênc şêst salî Kurdê Cihû dev ji Kurdistanê berdan Kurdîtiya xwe li şûn xwe hiştin û li pey ola xwe çûne Isra'îl, diyar e ku welatek bi navê Elewiya çêbibe wê Kurdê Elewî jî weke yê Cihû li pey ola xwe herin. Ne ew tenê, na Kurdê şî'î jî wisa. Kurdê Filî yê ku Sedam ew ji Bexdê deranîn û em li ser wan giriyan lê piştî ku Sedam çû piraniya Filiyan ji ber ku ew şî'î bûn ew jî li pey mezhebê xwe çûn û li gor gotina di helbijartina de jî degnê xwe dane şî'iyan, û nedane Kurdan!?.

Kurdê Êzidî jî û nexasim piştî kuştara Şingalê bi sedan deng ji nav wan derdikevin û dibêjin em ne Kurd in.! ji xwe nakokiya dîrokî ya di navbera Sora û Behdînan de kes nizane wê li ku bisekine?!! ji lewma jî Başûrê Kurdisatn îro li ser erdê du parçe ye "Silêmanî û Hewlêr" û em hîn dibêjin me Kurdistan divê. Ez dibêjim:

Pêşî em li Kurdan bigerin û dûv re Kurdistanê bixwazin…

# Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

# Hunermend Se'îd Gabarî Ji Bûyerpress Re:

## Xelkek heye xwe dike siyasî, lê ew simsarê qaçaxçiyan e.. Berê millet dide kuştinê.. Bulxarya, derya, û xeniqandinê .. (2 -2)

- Min serok Mes`ûd û birayê wî û partiya wî jî rexne kirine û min gotiye " Wan mesûlê toz û ba milet kirine sînema".
- Telefizyona Ronahî telîfonî min kir û got: Madem navê serok di strana te de tuneye em belav nakin, ma ev ne zulm e, ma ev ne tawankarî ye ?! .
- Xelkeke li vir heye, perwerdeya Sedam Hisên e, her dem dixwaze xelkê biêşîne, malê wî û mafê wî bixwe.
- Ez nikarim herim studyo û rêvebirê gîştî ê ku bi "Wastê" hatiye danîn û bi zimanê "Golka " jî nizane nerîna xwe li ser min bimeşîne.
- Ez bi hêvî me ku Ehmedê şêx Salih bes xwe veşêre.. bes xwe veşêre, û rim di tûran de nayê veşartin.
- Qaşo hûn dibêjî em Rûdaw in, dengê wêrekiyê û rastiyê ne, hûn qebûl dikin zor li kesekî feqîr bibe..!
- çi tiştê pîs heye di holên girtî de dibêjin hev . . .Tenê li ser masa xwarinê û dema kevçiyê girarê lihev dikin.



Hevpeyvîn: Qadir Egîd - Hewlêr

**- Helbet te gelek stran çêkirine û gelek hunermendan ji te birine, hindekan ji wan destnîşan kirine û hindekan jî destnîşan nekirine, tu dikarî ji me re hindek mînak bibêjî?**

"Ev pirs di beşê yekê ji hevpeyvînê hate kirin, û ev berdewamiya bersivê ye":

Koma Berxwedan mezintirîn stranên min û yê xeyrî min jî dzîne û negotin malî ava, yê min wek: " Bindest Kî Te Bistîne" ew ya Imerê Le`lê bû, û min di 76an de gotiye. Çawa diziyê dikin .. wê ji koplêya pêşî bidizin û li ser kêfa xwe li ser wî esasî ava dikin, û piştre wê bêjin bijî filankes û filankes, ew dibe wek " tirşka mala Hecî Elî "nok û nîsik û savar hemû tev hev dibe.

**- Gelek hunermend te dibînin dibistan tu xwe wisa dibînî, di nerîna te de çi mercên ku divê di hunermend de hebin ta ku bibe dibistan?**

Na, qet ez xwe nabînim, ne ji aliyê payebûnê de, na, ez Hemê Îsê êzdî, Birê Şerqî, Baqî Xido, Silo Koro, û Reso dibînim dibistan, em ne dilopek ji behra wan in, min tiştin ji xwe re ji wan ezber kiriye. Dibe ku di nerîna xortan de ez dibistan bim, lê ez qet xwe nabînim dibistan yek carî, biçûktirîn dilop di deryaya Hunera Kurdî de ez im.

**- Te li ser şoreşa Sûrî û bi taybet ya Rojava straye?**

Min du caran gotiye, carekê min" Qamişloka minê" gotiye, carek din min yek gotiye lê min belav nekiriye, û ez ê vê yekê jî bi zelalî bêjim, min yek li ser keça Efrînê Arîn Mîrkan çêkiriye ya ku li Kobanî xwe şehîd kir, min xelas kir, **telefizyona Ronahî telîfonî min kir û got: Madem navê serok di strana te de tuneye em belav nakin, ma ev ne zulm e, ma ev ne tawankarî ye ?! .**

Helbesta wê stranê jî ev e :

Fermandara Kurd Arînê
Nêrgiza çiyakê Efrînê
Rêka te girtî pîroz e
Rêka jiyan û vejînê
Te bi wê xwîna xwe ya pîroz
Bilind kirin ala û doz
Me jî bi te re peyman û soz
Em dê bigirin rêka jînê
Tu Berîtan û Zîlan î
Tu qehreman û şervan î
Taca serê me Kurdan î
Pîroz bik rêka behînê
Bilind e nav û dengê te
Dinya pir bihîst cengê te
Soz be, ez bême Kobanê
Û maç bikim axa bin lingên te
Ez ê çibikim..!? Yan ez bêjim bijî filankes yan stran belav nabe, ma ev ne derdeke bira,..!

Herwiha min li ser fermana Êzîdiyan jî, li gor mentiq û zimanê şengaliyan min gotiye.

" Ferman e ne payîz e
Ne buhar e ne jî zivistan e
Havînek bê ol û bê dîn û bê îman e
Serê zarokan li serê çiyan
Mejiyên wan kelyane
Xwedanekî xêran tuneye
Here bi hawara wan e
Deh roj û deh şev
Zaro û zêç li serê çiyan pirçî mane
Pîreka dergûşên zikê xwe
avêtin şikefta û hêlan e
Ey xwedê qey nayê te dengê wan e
Qey tu nabhîzi qîr û hawara wan e
Gelo kî wan heye ji xeyrî
pêşmergên Kurdistan e"

Lê dema ku ragehandina me bi partiyan ve gêradayî be, wê rewşa min û te wisa be, ne rojnameya te tê xwendin ne jî tembûra min tê guhdarkirin, lê ez bi hêvî me – piştî vî temenî - ku ev keda min û te û keda dê û bav û kalê me…(Li vir kela girî hunermend Se`îd Gabarî girt, êdî nema dikarîbû berdewam bike û lêborîn xwest…).

" Ev hest e ne hesin e" piştî 46 sal xizmet di hunera kurdî de, ji min re bê gotin em strana te peya nakin yan tê navê kesayetiya bêjî . em di sala di 2015an de ne ev şerm e, li Efrîqiya jî ev sîstem nemaye, ev tişt min vedgerîne dema sîstema Stalîn sala 1940, tevî wilo ez gelekî bi hêvî û geşbîn im ku wê walatê me ji vê xwariyê, çewtiyê, û ji van tiştên ku tên kirin pêş bikeve, û wê rastiyekê ji xwe re hilbijêre… Em bi hêvî ne …!

**- Çima Seîd Gabarî venagere Rojava, sedem çi ne siyasî, malbatî, yan civakî ne?**

sedem siyasî ne..!

**- Van peyvan bi yek peyvê şîrove bik?**

**Rojava**: (Bi keser) Hêsir e.

**Cegerxwîn**: Birceke mezin e

**Seydayê Tîrêj**: Birceke mezin î dî ye.

Mihemed Elî Hiso: Hevalek ezîz û delal e, pir jê hez dikim.

Qet negiyaye mafê xwe. Cudahiya di navbera min û wî de ku ew ji Qamişlo derneketiye, lê ez derketime, min dinya lihev xistî ye, wek Zîna Qereçî me. Ger tu ji Qamişlo derkevî tu hest dibe ku millet tiştekî dide te, ez berî çend rojan li Nisêbînê bûm ahengek hebû, ya hevalên me yn PKKê bû, lê min dikarîbû gotina xwe bi rastî li ser maykê bibêjim, û hemûyan ji min qebûl kir.. serê stranê digotin şehîd û binê stranê digotin şehîd, min ji wan re got gelî ciwanmêran ev aheng e, keç û xort dighên hev dîlan dikin, çavan didin hev, belkî qebahetan jî bikin, lê şerm e ku hûn termê şehîd tînin vê navê, cenazeya şehîd muqedes e, şerm e ku hûn vê bêhurmetiyê bi şehîdan re dikin.. millet jî ev yek ji min qebûl kirin.

**Herêma Kurdistan**: Penageheke ji bo Seîd Gabarî û sedê wek min e.

**Şivan Perwer**: Hunermendeke..

**- zêdetir**?...Na.

**Mihemed Şêxo**: (Careke dî kela girî ew girt lê di nav pêla hêsran de berdewam kir) Ew du caran cihê wî li cem min heye, carekê ji bo feqîriya wî û carek dî ji bo ku hunermend bû û malbata wî digotin em Ereb in - Mihelmî ne- û wî li ser xwe qebûl nedikir.

**- Mamoste Seîd jiyana xwe ya rojanc çawa derbas dike?**

Ez gundî me, gulistana xwe av didim, û avjeniyê dikim, qehwa xwe ji xwe re çêdikim, dinya bûye dema jinê:

Dem û dewara dinê
Ax felekê mala minê
Zîlam ket bin emrê jinê
Jinka teksî û cêb ajotin
Zîlam çûn firax şûştinê
Werne kovan û van xeman
Dewran daya serdeman
Piştî qernê ku em ketinê
Zîlam çi bûne sînema

Ez jiyana xwe rojanc di nav xelikê xwe û civata xwe de derbas dikim.

**- Projeyên te yê hunerî di pêşerojê de çi ne?**

Niha ez ê di radyoyekê de kar bikim, biryarek derket ku ez programekî keleporî çêbikim, tê de behsa bajarê Kurdistanê bikim wek mînak Amûdê û gundên derdora Amûdê çi hene û kî dengbêj li wir hebûn, jiyana Amûdê çawa birê ve diçû û wisa, çend tilfizyon daxwaza min dikin lê ez naçim, ji ber ez dixwazim serbest bim. Ji ber ez nikarim herim studyo û rêvebirê gîştî ê ku bi "Wastê" hatiye danîn û bi zimanê "Golka " jî nizane nerîna xwe li ser min bimeşîne.. ji xwe partî û serkirdayetiyên wan tenê hez golikan dikin.

**- Çima para Kurdistana Bakur di hunera te de kêm e?**

Kurdistana bakur cihê wê di dilê min de taybet e, min gelek li ser bajarên wê gotiye, ji 75an de. Lê problem ew e ku ragehandin nahêle, telefizyina kê heye ji bilî ya wan, di ya wan de jî ku ti navê hin kesan nebêjî te li ser ekranên xwe dernaxin.

çi stranê min derbas nebûne bê ku ez navê Mûş, Wanê, Farqînê, Silîvan, Batmanê, û Diyar Bekir tê de bikar neynim.

**- Ti çi şîretan li hunermendên Kurd dikî û bi taybet yên ku filiklor dibêjin?**

nûjeniyê bikin lê ji qalibê wê dernexin, dîkor û perwazek mûzîkî jê re deynin, lê ne sitranek wek "Xensê Xensê" tu bikî dîsko ji ber ku nema em jê fêm dikin.. Wek mînak, min D. Nurdîn Zaza berî mirina wî bi demekê nas kir, go carek min "Mem û Zîn" li gorî xwe wegerandibû û min bir ji Cegerxwîn re, wî jê re got birawo te ji rewşenbîran re wergerandî ye, û rewşenbîr di nav me de kêm in, te bi zimanê gundiyn çênekiriye, hîn em di mûzîka xwe de bandora gelek ji van kesan li ser min heye wek Usivê Çelebî, Hizniyê Şêxî, Xidirê Omerî û Miradê Kinê, ew hîn di guhê me di cihê wan heye, ez ne bi vê re me ku sitranek kurdî filklorî û bi zehmetî hatiye çêkirin û tu mûzîkek Emrîkî deyne ser.

**- Wek mînak Ciwan Haco?**

Ciwan Haco rengê dengê wî wisa ye ji ber vê yekê ez tu rexnan lê nakim, ta radeyekê zanebûna min di dengan de heye, Ciwan Haco nikare sitranaên Rojhilatî bibêje ji ber dengê wî zêdey wilo ranabe, û ez gelekî ji Ciwan Haco hez dikim, wî ji xwe re ev rê hilbijartiye û rêzê ji riya wî re digrim.

**- Di nerîna te de gelo pêwîst e hunermend ji serokan re bistirê?**

Qet ne pêwist e, min ji serokan re straye di dema ku pêwîst bû, min ji mele Mistefa re straye, û ez ne poşman im, min li ser qadî Mihmed straye û ez ne poşman im, hin caran min ji serok Mesûd re gotiyê, û dîsan ne poşman im dibe ku tu min di vê yekê de şaş dibînî, tu dikarî rexnê xwe li min bikî, lê her kes dizane ku Mesûdê Berzanî çiqas qurbanî daniye, xwediyê sê birayên şehîd û 8000 kesên enfalbûyî ye, ap û pismamên şehîd in, tazîbûn û birçîbûna Iranê , xwediyê hemû tiştî ye, di baweriya min de serok Mesûd hêja ye ku merov sitranan li ser bibêje û dîrok ro bi ro vê yekê tekez dike, ger Mesûd neba kî dizane ku wê rewşa Kobanê çi ba, Mesûd neba ev prosêsa aştiyane di navbera PKK û Tirkiyê de wê naba, lê tev wilo jî min serok Mes`ûd û birayê wî û partiya wî jî rexne kirine û min gotiye " Wan mesûlê toz û ba milet kirine sînema".

**- Mamoste te ji gelek helbestvanan straye, tu bêtir lê kê rehet bû ?**

Ehmedê şêx salih bû ji ber ku pîvanên wî di helbestê de wek dilê min in û zaravê wî kurmanciyek dirust û xweşk e, Ehmedê şêx Salih di " Şoreşa Pak û Nehêl û Xanedan" de ez derbasî qonaxeke dî kirim, hişt hastên min bi xem û şikestinê zêdetir bibin û piştî şikestinê çawa xwe ava bikim.

**- Tu çi name yê ji vir jê re dişînî?**

Ez têm destê wî ji vir ta Endîwerê, ez bi hêvî me ku bes xwe veşêre.. bes xwe veşêre, gelekî xwe veşart, û rim di tûran de nayê veşartin.

**- Mamoste Seîd bi çi zeravî nestiraye û dixwaze bistrê?**

Min bi hemû zeravan sitraye… Ta zimanê qereçiya jî.

**- Dibêjin mamoste Seîd gelek alîkarî bi penaberên Rojava kiriye?**

Ez wê nabînim alîkarî tu carî, û ez ser xwe qebûl nakim..(Li vir ne tenê kela girî mamoste Se`îd digre.. lê ew bi dilekî şewat giriya) .. ez li ser xwe qebûl nakim, ji ber ku ev erkê min e, ji ber ku min nanê Qamişlo, Serêkaniyê, Dêrikê, Efrînê, û Kobanê xwariye, min tu tişt ji wan re nekiriye.. filankes derbas nebû, ez ê telefonekê lêxim ez ê wî derbas bikim, yan filankes bê çadir maye, ez ê alîkariya wî bikim, an jî filankes bê war maye ez ê deh rojan wî bînim gel malbata xwe, qet ez qebûl nakim ku ev alîkarî bê ziman, ez ji te re rastî dibêjim ji ber ku ev kêmtirîn erk e ez ji bo gellê xwe dikim.

**- Malbata herî ku tu bê êşyaye kî bûn, çiroka wan çibû?**

gelek hene, êş gelek in, hatine welatekî din ne wek welatê me ye, tevlî rêz û hirmeta min ji Kurdên Iraqê û şehîdên wan û ked û xebata wan re, lê xelkeke dî li vir heye, perwerdeya Sedam Hisên e, her dem dixwaze xelkê biêşîne, malê wî û mafê wî bixwe, di baweriya min de eger ez ne alîkar bim jî lê min beşdariyek baş di alîkariya vê xelkê de kiriye.

**- Tu li kîjan bajarê Kurdî nestiraye û tu dixwazî bistrê?**

Xwezî min li Mehbad straba, di sala 1983an de li Mehbad ez çûm meydana Çarçira, kula min bû ez herim wê deverê, xortekî got ez ê te bibim wir û ez li cem te nasekinim ji ber ku wê min jî bigrin, min helbesteke xwe li wir xwend û ez giryam, dilê min şewitî, rejîma Iranî ji ber ez giryam min 15 rojan xistin zindanê de, lê 13 rojan min ji lêdanê (tirrek) kir.

**- Berî demekê me li ser ragehandinê jî şopand te wek kesayetek te destwerdan di pirsgirêkek trafikî de kir ku evserekî Hewlêrî zordarî û ziyan gihandibû ciwanekî Rojava, ew mesele gihaşt ku, û çima te dît wek hunermend divê tu destwerdanê bikî?**

Wî evserî ez dam dadgehê jî, karê min û zindanê jî kiribû, lê yê fermandar gote min tu bêguneh e, û yê ciwanê Kurd jî reviya Rojava, dibe ku hindek pere dabinê û razîbûna wan jî bê min li piş perdeyê çêbû, dibe ku hindek pere stendibe yan gef lê xwaribin, lê min jê re şand û got netirse, yê fermandar min girt, min jê re got tê min bixe zindanê ya ez ê bersiva xwe bidim, gote min bersiva xwe bide, rabû ez axivîm, ê fermandar ez maç kirim û gote min here tu bêguneh e, ew derewan dikin, evser û polîsan piştа hev girtiye, û derew li te kirine, pirsgirêkeke min bi Rûdaw jî re çêbû, wan jî gazin kiribûn, çima te em xistin vê meselê de, min got qaşo hûn dibêjî em Rûdaw in, dengê wêrekiyê û rastiyê ne, hûn qebûl dikin zor li kesekî feqîr bibe..!, mirov birîndar bûye û hîn lê jî dixin.

**- Rast ewek te gotiye serkirdeyên Kurd li holên girtî û li kongiran bihev dikevin, û piştre daxuyaniyekê ji millet re derdixin û doza yekîtiyê dikin, gelo ew dikarin miletkî birêve bibin?**

Ew qet nikarin.. eger kesek ji bilî wan di van rewşên nazik de heba minê partiyek ava kiriba, ji ber ew çi tiştê pîs heye di holên girtî de dibêjin hev, û li derve doza yekîtiyê dikin û gerefatên xwe rast dikin, û xwe dikin nimûne, tenê li ser masa xwarinê û dema kevçiyê girarê lihev dikin.

**- Gotina dawî ji xelkê Rojava, rojnamevanan, hunermend, û ji milet re ?**

ji rojnamevanan re serkeftinê dixwazim, hêvîdar im ku zehmetiya kişandine hêdî hêdî barê wan sivik bibe, karibin bi emanet nameya xwe ragihînin. Dixwazim ji Xelkê Rojava re bibêjim, mixabin dijminê Kurdan gelek in, hinek ji partiyên Kurdan jî di nav de dixwazin Rojava vala bikin, bi nîşan ku ji Dêrikê ta Serêkaniyê xelkên Xemir li ser dilê me paldayî ne, tu kesî ji wan re negotiye quzelqert, xortên me hem propaganda ji qaçaxciyan re çêdikin berê wan didin Ewrupa, ji ber ku ez zanim ku xelkek heye xwe dike siyasî lê ew simsarê qaçaxçiyan e, berê millet dide kuştinê, Bulxarya û derya û xeniqandinê.

Dixwazim vê yekê bibêjim, milletê Sûrî hişyar bin, hûn Kurdên Sûrî ne, yên Rojava ne, hûn in yên ku alîkariya şoreşa Mela Mistefa kir, şoreşa Ihsan Nûrî Paşa û şêx Se`îd himbêz kir, we Nurdîn Zaza û mala Cemîl Paşa himbêz kir, li ber vê pêla pîs nehejin, welat welatê we ye, kolan a we ye, cih ê we ye, tu caran ew nikarin vî welatî vala bikin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

# Va Cejna Qurbanê Hat, Hûn Kanîn..?

Anahîta Sîno

Vaye cejna qurbanê li ber derî ye û wek em fêr bûne ji biçûkanî de ku di rojê cejnê de malbat li hev kom dibe, çi bikêf be, çi bi xemgînî be û vê kombûn kêfa me zêde dikir û xemgîniya me kêm dikir. Ev jî çandeke mebû û Em bi wê pirr kêfxweş bûn. Nuha ez dinerim ka kî ew ê lihev kom bibe?Kanî ew malbata ku karibe kom bibe? Her malbatek perçe perçe bûye û her perçak li derekê ye hinek li Başûr, hinek li Bakur belav belav bûne,lê dîsa em dibêjin ku rojekê bixwazin vegerin welatê xwe ewê bi hêsanî vegerin û caran em dibêjin ku ew di eynî xakê de ye yanî li Kurdistanê ne.
Lê ya herî merov diêşîne û herî zêde ew malbatên ku berî didn Ewrupayê. Ev jî roj bi roj zêde dibe ta bûye nexweşiyek û li nav xelkê bi xurtî belav bûye,wekî bahorê yek ji yekî pê dikeve.
Bê şert û merc zengîn, feqîr, xwende, nexwende ta gihaye malbatên şehîda yên ku xwîn li vê xaka pîroz dane. Tu herî kîjan taxê tu dibînî ku tiştên xwe difroşin û bi kêf dibêjin em ê herin Almanya..! Hin bi hin tax vala dibin, bajar vala dibin,xewnên sedê salan beravêtî dibin, Ewrupa li ber çavê wan bûye bihuşta li ser riwê zemînê, û derî ji wan re vekirî ye, mal, xwezayî, kaniyên meyê li meyxana diherike û periyên por zêrîn li kolanan mist in, kêf û seyran e.!? Milet ji bo van tiştên balkêş xwe li mirinê radikşînin pê li her tiştî dikin û biryara çûnê dibin û mirin wekî nêçîrvanekî jêhatî xwe daye benda wan kêf û seyranan.
Dehan li nav dehlan wenda dike, bîstan li ser qeyikekê difetisîne 71. mirov jî di bûzdolabê de jiyana xwe din. (mirin bûye hijmar(
Tevî wilo Ewrupa ew bihuşta ku merov ji bo wê jiyana xwe bide (Wekî oldarên asê). Lê heya kengî em ê li dû xeyalan birevin, heya kengî em ê li Ser kurtêlên xelkê jiyan bikin û xewn û hêviyên xwe li Ser derewan ava bikin??.
Tu carî bajarê xelkê nabe bajarê merov, bihuşta xelkê nabe bihuşta merov. Ta Ewrupa bû ew bihuşta ku em xewna wê dibînin, xwîn li kolanan herikî û gelek mirov di agir de hatin biraştin û em ê bi rehetî bi hêsanî herin û bibibin xwedî mal û milk.!!
Em nizanin ku tiştê bi xwînê bê bidestxistin bi hêsanî naye dayîn,heger em bi hêvî ne ku em ê herin wê deverê û bibin xwedî mal û milk û rûmet em pirr şaş in, û bi hezarê salan dûrî me ye, rastiyek heye, tenê em ê bibin ber dest, çi di çayxanan de, xwaringehan de, û çi di paqijya kolanan de yan jî li ber deriyê meyxanan bin, û yên gelekî li xwe giran bibînin û qebûl nekin van karan bikin wekî xwedî bawernaman (şehade) ew ê li mala xwe rûnên û bi minetî bi qehr û qotik jiyana xwe derbas bikin.
Pirsek di vê boneyê de xwe davêje bala merov, çima? Heger em di vê peyvê de mijûl bibin ew ê gelek pirs xwe bavêjin bala me!? Yek ji wan pirsên sereke çima milet bi vî rengî dev ji warê bav û kalan berdidin? Bê gûman sedemên wê hene,valabûna welat. qirkirina çandî, wenadakirina dîrokekê, kok kişandin,û çima di vê demê de?!! Ev pirsan û gelek pirsên wekî wan cihê xwe di mejî de digre û her pirsek ji van bi xwe mijarek û lêkolînekê ye, giring e em li ser wan rawestin, û şirove bikin lê nuha tiştê ez dixwzim bêjim ku welatê me ber bi xeteriyekê de diçe, divê di vê demê de hikûmeta me û partiyên me dest bidin hev û pirsgirêkan çareser bikin û tedbîrên lazgîn ji vê nexweşyê re bibînin, ji hikûmetê tê xwestin wekî erkek sereke li sedeman bigere û çareseriyê jê re bibîne. Ne tenê hikûmet û partî bangewazî ji hemû saziyan re ye, civaka sivîl, Rewşenbîr, nivîskar, raghandin, her kes bi erkên xwe rabin. Divê ev nexweşî were dermankirin an jî wê bighê hestî û êdî derman jê re nayê dîtin..!!

# Qaçaxçiyo ...

Mihemed Xêr Dawûd

Tu bi qedrê wan diravan bikî ku min ji te re li beravê razandine..
Dema qeyika me serûbin û niqum bibe bin avê…Destê min negre û min rizgar neke.. Lê çavê min bigre .. bera ez zaroka xwe nebînim dema pêlên deryayê wê daqurtîne.. zû serê min bixe nav avê, bera dengê pêlan guhê min bigre û nehêle ez dengê giriyê zaroka xwe bibhîsim..
Qaçaxçiyo ...
Tu bi qedrê wî wijdanê xweyî temirî bikî..
Dema qeyika me bibe lîstoka pêlên har û hedana wê nemîne, neke hawar.. bera ew qeyik di bêhnikên dawî de jê re bibe dergûş û zaroka min li ser çengên pêlên deryayê rakeve..
Qaçaxçiyo ...
Eger te xwe rizgar kir.. li beravên deryayê li sola qetyayî ya zaroka min bigere..min berya cejna bihurî jê re kirîbû û min jê re gotibû ku dema em bighêjin meqseda xwe ez ê solek nû û xweşik jê re bikirim.. wê solê bi qeyika Qaçaxçiyekî din veke ji bo ji çavan parastî be û niqum û bin-av nebe..
Qaçaxçiyo ...
Eger Te xwe rizgar kir, ji zarokên xwe re çîroka min bibêjî ku çawa bavekî soza jiyenake nû da
zaroka xwe û soz da zaroka xwe ku di kel-kela germa havînê de wî bibe beravên deryayê, lê soza xwe nebir serî û jiyana wî bidawî anî û li şûna qeraxên deryayê, ew avête binê wê..

# Zimanê Me Hebûna Me Ye

Vejîna Kurd

**Lê îro, sedmixabin, em dibînin ku hin nivîskar û rewşenbîrên Kurd hene ku berê xwe didin zimanê dagîrkeran û berhemên xwe bi zimanê wan diweşînin, tiştekî ji aw û şêweyên nivîsanda bi zimanê Kurdî pêş naxin û di rewşenbîriya Kurdî de jî naxebitin, nêrîn û nirxên biyaniyan di mejî û bîra mirovan de diçînin.**

Ziman beşek ji mirov e, ew jiyan bi xwe ye... Miletê ku li zimanê xwe xwedî derkeve, ew milet encama pêşveçûn û serkeftinê werdigre û şaristaniya dewlemend ava dike, li aliyê din jî miletê ku guh nede girîngia zimanê xwe, bêguman ew tarûmar dibe û di nav civakên mezin de dihele
Apê me yê nemir Osman Sebrî dibêje:
Bijîn kesên ji bo zimên dikin xebatê
Ewin berê gel diguhêzin riya felat
Ev jî tê wateya ku, bi zimên dîrok, çand, wêje, zargotin û hebûna miletan tên parastin û pêşxistin. Eger em dîroka Kurdî bişpînin em ê bibînin ku xem û pirsgirêkên civak û gelê me gelek in û rewşên pir taybet di ser kurdan re derbas bûn, zimanê wan qedexe bû û derfeta hînkirin, çapkirin û belavkirinê jî tune bû, lê tevlî wê jî, pir helbestvan, nivîskar û rewşenbîrên welatparêz, li ziman û kurdayetiya xwe xwedî derketin,bi rikî, wêrekî û pêşdîtineke hişmendî, bi zimanê xwe yê zikmakî nivîsand, û gulistana toreya Kurdî bi helbest, roman, destan, serpêhatî û çîrokan xemilandin û kultûreke dewlemend ji nifşên pey xwe re hîştin...
îro jî navên wan gorbuhiştan di asîmanê wêjeya Kurdî de vedibrûsin mîna: Celadet Bedirxan, Ehmedê Xanî, Rewşen Bedirxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî, Melayê Cezîrî..... û gelekên din, û bêguman ew kar û xebata wan cihê rêzgirtineke mezin in. Lê îro, sedmixabin, em dibînin ku hin nivîskar û rewşenbîrên Kurd hene ku berê xwe didin zimanê dagîrkeran û berhemên xwe bi zimanê wan diweşînin, tiştekî ji aw û şêweyên nivîsanda bi zimanê Kurdî pêş naxin û di rewşenbîriya Kurdî de jî naxebitin, nêrîn û nirxên biyaniyan di mejî û bîra mirovan de diçînin, ango em dikarin bêjin ku ew û berhemên wan dikevin xizmeta zimanê dagîrkeran de.
û di heman demê de gava xwendevanek berhemên wan nivîskaran dixwîne, pirsa yekem ku di mejiyê wî de digere ew e: Çima nivîskar bi erk û ustubariyên xwe ranabe û ramanên xwe, wek tê xwestin, bi zimanê gelê xwe yê zelal û xweşik narjîne ser kaxezê?!!
Ma qey baweriya wî bi zimanê xwe yê kevnar, dewlemend û pir zarav tune ye?!! Hêvî û daxwaza me ji wan nivîskarên hêja ew e ku coşa hezkirina zimanê Kurdî neçelmisînin, fêrkirin, parastin û pêşxistina zimanê Kurdî li giyanê xwe bar bikin... xama pênûsên xwe ji kaniya zimanê xwe yê resen werbigrin û dara wêjeya Kurdî bi berhemên xwe av bidin. Û wek mamostê me yê nemir Kemal Henan gotiye : " Ustubariya herî girîng û pêwîst ew e ku zimanê me bête parastin û nûjenkirin ".

# Hin Tên Li Ewrupayê Dibin File..!



Alan Pîr Mem

Ji xwe di van her çar salên dawî de, û ev pêlên mişextiyê û koçbûna bi hijmarên mezin ji welatên ku nema welatin ku bûye her roj, bi hezaran penaber li Elmaniyayê bi teybet û li deverin din ji Ewrupa xwe wekû penaber tomar dikin, dibêjin em revyayî û birçî ne, û nema wêrin di malên xwe de rûnên! Ya giring ji xwe ji wan re ew e ku bi cî bibin û nan û ava wan ji wan re bê ango pêdiviyên jiyanê bi dest bixin, ji xwarin û vexwarin û hem derman jî , û jê pê ve tev de vala ye, ne lê zêde dike û ji xwe jê kêm nake.
Lê ka ma tev de jî bi cî dibin, ji xwe na, hin têne pijirandin û hin din jî ji wan re dibêjin: Heydê xwe hazir bikin û oxra we ya xêrê, be nabe hûn li vir bimênin, bi wateya ku penabertî ji wan re dernakeve (penabertî jî li vir bûye xal û xwarzê) lê ji xelkên Sûryayê re biçekî rewş taybet e, ji ber şer û dera han, lê tiştê ku nayê gotin êdî li vir destpê dike, îcarê zaro dibin file û ji bo çi? Ji xwe gava ku tu ji wan dipirsî, li te vedigerînin û dibêjin: Xwedê giravî Musilmanan tiştek ji me re nekir û ne dikin û va em li van deran e, li welatên ku Musilman ew bi xwe re fêrî vê çanda qirêj û gemar kirin (li gor gotina wan), lê ew bi xwe ne wilo ye bi carekê re, vaye ciwanmêra pêşwaziya me dikin û me bi cî dikin û pera didin me û bi Euro jî, îcarê ma File an Misilmantî!!? Ku li Erebistana Si`îdî welatên wekî din ji Turkyayê an Kurdistana Îraqê hete an Urdin an Libnanê, ji xwe ev gawir bi hezar carî ji wan çêtirin, û ji bo wilo em dibin File!!.
Baş e, lê tu nabêjî tiştekî din jî li wê navê heye ji me re nadin xuyanîkirin û herdem jî vedişêrin, tu nabêjî hetîketiya reş ji xwe di wir de ye, zaro dibin File ji bo ku êdî dilê Fileyên Ewrupa bi wan bişewite û mafê rûniştinê bidin wan, ango hema bi kêmanî bernedin wan an wan bi salan bê mafê rûniştinê nehêlin, îcarê nema dikarin kar bikin, ne bixwînin, ne derkevin dervî welatê ku lê ne, zaro dibin File ji bo pel melên wan bi serî bibin, û êdî mafê xwe yê fermî bi rûniştina li Ewrupa werbigrin, û êdî carê bikarîbe mêrkê me pê ji xwe re dakeve Turkî, here serdana çend mervên xwe yên belengaz ku nan tine ye bixun, û xwe paye bike û xwe li ser bibîne, vaye mêrik bûye Ewrupî, lê rebeno nizane ku wî li wir " Xwe avêtiye wan û bextê wan û dêrê " û xwe ji wan re kiriye erd, bûye File (ya giring ji xwe ev e) heyanî ku bi zorê ew hiştine û mafê fermî bi rûniştinê danê.
Îcarê yê ku do Musilman bû îro bibe File wê sibe bibe tiştekî din jî, mane bercewendî ye û bercewendî ye, êdî çi ji ber bimêne tişt pê ve tine, lê ka ji xwe me ji bîr nekiriye, ka yên ku li Ewrupa ji nûv re bi xwe hest dibin û êdî li Musilmantiya xwe vedigerin çima vê yekê tînin serê xwe? Veya em ê careke din ji were bibêjin, wê xelekeke didwa ji vê gotarê re hebe .

# Kêla Gora Alan Dê Bimîne Nîşana Xewnên Nîvco

Malav Elî

Weke bayê bezê di nav pêlên deryayê de, û ji nişkî ve av gewriya jiyanê bidarve dike, jiyana ji ser lêva şûrê mirinê werbûyî û ber bi şûrê buhiştê ve barkirî, dibe keleka necdîvana, lê çaxa bîna giyan di asoyên şevê de belav bibe û şev xwe li gewriya peyvan bialîne, çendî hewl bide ku cil û bergên bûkaniyê li ber xwe bike, ji bilî paçê sipî tu kiras nîn in, li giyan bête pêçan, di kêferata bi deryayan re çi qasî tu bi newqa demê bigrî û bizava mayinê bike, dem ji himêza te difiştiqe !!.
Piştî çend xulekan Alan bi bişkurîneke sirt û xewna siwar bûna bayskilê, bê deng, li hember kîna deryayê rawesta, narvîn tu derfet ji omêdan re ne hişt, heçkû peyv ji lêvên mirovan biweşin, xewin û hêvî ji giyanê Alan weşiyan, tenê di himêza kirasê şîn de peyzok di rêsan,û demê jî bi bayê şev diz derfet ji sawêran re ne hêlişt ta li baysikilê siwar bibe, di nav pêlên du çavên şîn de di himêza Gulê de, xewin ji tilyên xewê herkîn.
Çendî giyan beza û bi bîn be di hevsingiyên bezê de li hember pêlan, dê nikarbe bîna avê biçikîne, û dê di bin lingên avê de têk biçe, ji ber derya di himêza torên nîçîrvanan de xewnan kom dikin û di bazarên reş de wan difiroşin û tu xewin di himêza avê de bi dawî nabin, av kil ji çavên şevê didize û parsiwê hêviyan di bin baskên xwe de dişkîne, Alan di himêza çavên Gulê de dinive ta bi sipêdê re lingê xwe li goga zemînê bide û bibe yarîzanek herî navdar di cîhanê de û tenê rûbelekî biqasî bejna xwe li Kobanê hilbijêre, Xalib jî Gulê û Alan di landika hêzinkan de dihejîne û di nav kêla girî de giyanê xwe dispêre landika êşan û di pêsîra tirsê de xatir ji Ebdulla dixwaze.
Firmêskên mîr û şahan gurbûna agirê di hinavan de venamirîne û dilên piçûk ji torên dizên xewnan di nav pêlên serxweş de li keviyên jiyanê na êwirîne, tenê weke dar û berê gemiyeke binavbûyî di kûrahiya deryayan de giyan penaber dibe, penaberiya di kurahiya deryayan de, hemî pencereyên hêviyan digire û tenê weke ji bermayên xewnan li keviyên zemîneke bi xîz di qefe, xîza ku mirov bi tilyên birînê nexşeya mirina xwe li ser sînga wê radixe .
Rondikên peyvan, kevên rupelên şewtî şil naken û kirasê şîn di hevrikiyan de, dimîne rûpeleke ziwa û derzan di dilê mirovahiyê vedike, çi qasî mirov li pey bîna buhiştê bikeve ji bilî firiştên deryayan tu sêvan ji dara jiyanê naçipîne, koçberî dimîne xewneke nîvco, û bêrîkirinek bi pîneyên êşê tê xemilandî.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

# {Hayilê Gulê Gula Minê.... Şêrîna Ber Dilê Minê}
# Rêncber.. Helbestvanê Mezin Emerê Le'lê Nas Bikin.




**" Di vî serdemî de**
**Her Kurdek divê welatê xwe binase**
**Her Kurdek divê dîroka xwe bizane**
**Her Kurdek divê zimanê xwe bizane**
**Her Kurdek divê berevanê welatê xwe be.**
**Hingê em ê rizgar û azad bibin"**




Dema mirov bixwaze li ser yekî xuyayî binvîse divê mirov mafê wî bidiyê, nemaze ku ew kes di nav civaka xwe de naskirî be, pencemora wî di tore û xebat û karê siyasî de hebe, bi nav û deng be, di nav civaka xwe de heskirî be, ji ber ku ew î kariye navê xwe di dîroka gelê xwe de binvîse.
Ji min hate xwestin ku ez tiştekî li ser binvîsim belkî hinekî bi min giran bû, ji ber ku ez nikarim mafê wî bidimê weku kesekî pispor û ekadîmî, lê hêvîdar im ku bikaribim beşekî ji mafê wî bidimê, ji ber ku pêwist e çandeser li ser bêne çêkirin bi rengek berfireh hemî aliyê jiyana wî bê ronîkirin, weku hozanvan, siyasetmedar, kesayetî, ji ber ku weke serbazek nediyar bû, kar û xebat dikir bê westiyan dûrî ragehandinê û piropogindayê her dem bihêvî bû, geşbû, bi doza gelê xwe re, di jiyana xwe de bê hêvî nebûye baweriya wî bi vîna gelê wî dihat didît ku hêza gel ji her hêzê zexmtir û xurtir e.
Jiyana wî weke jiyana miletê Kurd e, koçberî ,penaberî, îşkence, girtin, zindan, hejarî, kar û xebat serbilindî, berdewamî di kar û xebatê de, di nivîsandinê de, hişkî di berevaniya xwe de ji bo mafê miletê xwe, di armancên sereke de .
li kû derê rûniştiba berevaniya doza gelê xwe dikir û mafê gelê xwe diyar dikir berevanê doza xwe bû li ser rêbaza Barzanî bi serbilindî doza gelê xwe diajot bê tirs û lerzîn, herdem xwe didît rêncberê doza gelê xwe ji lewre xwe kir Rêncber .
Hozanvan û nvîskarê Kurd Emerê Le'lê ( Rêncber ) jı dayıkboyê gundê Qesirdelayê di sala 1935an de ya dikeve rojhılatî Cizîra Botan de, ser keva ava mezin
hatiye jiyanê, bi navê Emerê Le'lê hatiye naskirin, jı ber di biçokatiya wî de bavê wî çûye ber dilovanya Xwedê û diya wî "Le'lê" dibe xwediya malê ji ber vê egerê bi navê diya xwe hat binav kirin.
Emer kurê Hesen e kurê Ismaîl e kurê Mihemed e kurê Mehmûdê Adya ye, di binemala xwe de ji êla Dêrşew e, ew jî êleke bi nav û deng û naskirî ye, dı herêma Botan de li Kurdıstana Bakur piştî şikestina şoreşa Şêx Se'îdê Pîran û jı ber îşkence û cırnexweşiya dewleta Tirka gelek malbatên Kurdperwer ji Kurdistana bakur derbasî Kurdistana rojava bûn, û wî heyamî Firinsa desthilatdarî li Sûriyê û Kurdistana rojava dikir, malbata wî jî yek ji wan malbatên bê çare man û derbasî Kurdıstana rojava bûn û li gundê Eyndîwerê datînin ya dikeve ser keva ava mezin (Çemê Dicle) beramberî Cizîra Botan piştî çend salekî li wir dimînin, bar dikın û diçin gundê Mezra Jêrî ew jî gundek xweş û dilgîr e dikeve rojhılatê Eyndîwerê bı dirêjahiya (3)KM. dıkeve ser keva ava mezin, bamberî gundê Mehmidiyê piştî çend salekî li Mezrê dimînin bar dikin û diçin gundê Til Xenzîra Jorî li wir diçe dibistana gund bi zimanê erebî dixwîne, ta xula diduyan, li dibistana gund dixwîne piştî wê nema kariye xwendina xwe berdewam bike ji ber egera hejariya malbata wî û li wir dimîne arîkariya malbata xwe dike, hin bi hin ta mezin dibe û hevjîna xwe li gundê Til Xenzîr di sala 1957 an de tîne.
Ev ne akincîbon û barkirin ji deverekî bo devera dî encama kawdanên nexweş û hejarî û ne aramiya belê ji ber ku jiyan bi rengek hejarî dihate derbaskirin ji lewra ji gundek bo gundekî dî diçûn ji bo jiyana xwe xweş bikin .
Di sala 1958 carek din jî bar dikin û diçin gundê Zixatê ew jî gundekî xweş e, têr dar û devî bû, bi av û kanî bû Zixat dikeve rojhlatî Dêrika Hemko bidirêjahiya (12) KM. Li wir hestê netewî pê re dipije û tevlî refên Partî Dîmuqratî Kurd dibe, ew jî di sala /1958/ an de bû, li gundê Zixatê bi jan û êş û bindestiya miletê xwe dihese weku mirovekî helî di bîr û baweryên xwe de, kar û xebata xweyî siyasî dişopîne, û her weha dest bi nivîsandina helbestê jî dike.
Ji wê bingeha pêkhatî dest bi kar û xebata xwe ya niştîman perwerî dike, û di nav rêzên hevalê xweyî azadîxwaz de wek hevalekî bi biryar û têgihiştî û xûyabûyî, hin bi hin hate naskirin weku endamekî zana û jêhatî di tevger û têkilyên xwe de, ji bîr û baweryên xwe û rêça xweyî dîmuqratî derneket û nehat hejandin, nepekî û ne rast û çep çû, û li ser rêbaza Barzaniyê nemire ma û domandiye heta roja dawî.
Emerê Le'lê hatiye xuyakirin di derdora xwe de encama kar û xebata wî ya netewî û niştîman perwerî û civakî û torevanî ji ber vê jî gelek cara hatiye girtin û îşkencekirin di destpêka şoreşa Eylûnê de, bi mihan girtiyê zêndanê ma ye, û hatiye îşkencedan ji ber bîr û baweryên xwe û xebata xwe, lê bê hêvî nebûye maye girêdayî rêbaz û doza xwe ya rewa.
bi dehan pêşmergên şoreşa Eylûn û Gulanê di mala xwe de xwedî kirine, derbas kirine û rê kirine şoreşê û ji Kurdên Sûrî birayê wî Mihemed Hesen yek ji wan kesên pêşî bû ku tevlî şoreşa Eylûnê bû, lê tevî zilm û zordariyê jî nepekî ma xudanê bîr û baweriyên xwe. Xebata xwe berdewam kir bi bîr û baweriyên bi hêztir û xurtir ev tevger û bîr û baweryên netewî û kar û xebata siyasî bûn egerê destpêka nivîsandina helbesta Kurdî ya ku li ber dilê wî gelek heskirî bû.
Di sala 1958an ew î Yekemîn helbesta xwe nivîsiye ew jî li ser vegerana serok Barzanî ji Yekîtiya Soviyêtê bo Kurdistanê ku di wê helbesta xwe de dibêje:

Ax Kurdistan ax Kurdistan Tu cîhana me Kurdanî
Xwazgîniyê te pir zor in Ew xortên şeng û ciwanî
Ger tu nekî ji min bawer Vaye te dixwazê Barzanî
Qelenê te çiqas pir bê Me da te xwîna xortanî

ji wê demê ve dest bi nivîsandina helbestê kiriye bi sedan helbest û rist vehûnane li ser xeml û xêza Kurdistanê li ser evîn û jiyanê, li ser civakê, li ser şoreş û halanên Kurdî,








li ser keç û jina Kurd, li ser hemî rengên jiyanê.
gelek helbestê wî hatine gotin bi deng û awazên hunermendên mezin wek: Hunermend (M.Şêxo -Mehmûd.E.Şakir -S.Gabarî-K.Şêxo- Beha Şêxo -Şivan Perwer-Bilind Ibrahîm) û gelek komên filiklorî jî helbestên wî gotine û deng vedane li seranserî Kurdistanê wek:
- Eylê gulê gula minê şêrîna ber dilê minê.
- Xem û xeyalên te ez revandim.
-Yarek min heye bi navê jîne.
- Kedera min çendî ciwane rengê gulê.
- Perwîn keça nû gihiştî, Wa delala xudê hiştî.
- Peymana min şirîn yare Gul bişkivî nû bihare.
Û gelekên din eve hozanvan û hunermend çûne ber dilovaniya xudê lê helbest û awaz û deng mane û wê bimînin zindî di dîroka Kurdistanê de wê bibin dildevanê afrandina wan.
Di sala 1970an de endamê kongirê niştîmanî bû ya ku di bin çavdêriya serok Barzanî de hate pêkanîn ji bo li hevhatina Kurdên Sûrî.
Di kar û xebata xwe de berdewam kiriye bê rawestan hem di karê torevanî de û hem di karê siyasî de, yek ji wan kesên ku vîstevala helbesta Kurdî li Sûriyê damezrandiye û destpêk ji herêma Efrînê bû, û bi dehan helbestvan birine wê vîstevalê piştî çend salekî Emer vîsteval anî gundê Tildarê bi alîkariya Lorî Tildarî û Hişyarê Emer û di bêhtirîn vîstevalan de peşdar kiriye, di sala 1997 encama bûyerekî dil tezên navbera du mirovê wî de ,ji ber vê egerê ji gundê Zixatê bard ike û diçe gundê Mezrê piştî çend heyvekî diçê gundê Mêrga Mîra piştî du salan ji wir bar dike û diçê Şamê û li wir akincî dibe piştî şeş hefî salên ji jiyanek zor dijwar bi hejarî û perîşanî berê xwe didê Kurdistana azad li Zaxoka Behdîna akincî dibe, ji bal xelkên devera Zaxo tê heskirin.
Di du dîdarên giring bi serok Mesud Barzanî re Civiya ye.
du cara Xelefê Zêbarî ji êzgeha Kurdî ya emerîka pê re hevpeyvîn li ser telefonê kiriye .
û çendê caran êzgeha Kurdî ya dihokê jî pê re hevpeyvîn kirine û carekî tilvizyonaKTVya Kurdî jî pê re hevpeyvîn kiriye.
carekî tilvizyona GK jî hevpeyvînek pê re kiriye
pişikdarî bi dehan kongir û vîstevalên torevanî de kiriye
xelata vîstevala helbesta Kurdî wergirtiye dis ala /2006/an de.
xelata Sedayê Tîrêj wergirtiye sala /2006/
xelata vîstsvala hunermendê mezin Mihemed Şêxo wergirtiye ya li Hewlêrê hate lidarxistin di sala /2011/
bi du zimana zanê gotin û nivîsandin Kurdî û Erebî
pênc dîwanê wî hatine çapkirin
**1-Xem û Sawêr**, dîwana yekemîn bû ku di sala 1993an de çap bûye, hemû helbestên kevn in berhemên vê dîwanê hemû bûne stran û hatine gotin.
**2- Çar Çira,** di sala 2002 an de hatiye çapkirin.
3-Tewafa Yarê, Helbesteke ji 1520 malika tê jimartin, ev helbest geryaneke di Kurdistanê de, tê de havîngeh û xweşyên Kurdistanê û hemû tişta tîne ziman av û çem û seyrangeh kêm û kasî çiya û newal , ev helbest hatiye çapkirin li Kurdistanê ji layê yekîtiya nvîserên Kurdistanê tayê Dihokê di sala 2008 an de.
**4-Welat Binase**, bi taybete li ser nexşeya Kurdistanê ye, tê de nexşa Kurdistanê sînor sînor diyar dike bi rengek helbestî bi av û çem û kanî û ciya di nexşeyê diyar dike, di sala 2009an ji layê wezareta rewşenbîrî û lawan hatiye çapkirin.
**5-Evîn û Welat,** hin helbestin wî yên nû ne ev dîwan ji layê yekîtiya nivsîkarên Kurd hatiye çapkirin di çil rojiya wî de hate belavkirin
6- berhevkirina Serpêhatiyên Kurda di salên heftiyan de ji qirnê borî.
**7- Sê dîwanê wî destnivîs hene**, û nehatine çapkirin.
**8- Geleg nivîsandin** li ser bilindahiya hemî çiyayên Kurdistanê û cihê wa û dirêjahiya hemû çem û avên Kurdistanê
**9- Pirtûkek** dî jî heye li ser war û gundên hozên Kurdî û her hozekî çend gundên wan hene lê ev pirtûk bi dawî nebûye ji bo çûna wî bo Dihok û Hewlêr, Silêmaniyê, û Istanbolê, û vegeryan wî bo Zaxo û Dihokê lê paşî berev Sûriyê hat ji bo nesaxiya xwe li nexweşxaneya "Eseda Cami'yî" hate dermankirin başî vegeriya bajarokê Rimêlanê nîzîkî du heyvan ma dîsa vegeriya Zaxoyê, lê li wir dirêj nekir ji ber ku nexweşiyê lê dest da dîsa vegeriya Qamişlo û ji wir dîsa ber bi Şamê ve çû û heftiyekê li nexweşxaniyê ma, û hate Helebê û li wir jî çend roja ma û hate Rimêlan mala kurê xwe Ji kar û xebatê bêhêvî nebû ta nefesa dawî , her dem pirsyara yekîtiya rêza Kurdî dikir, di wê nexweşiya xwe de jî bi gelek serkirdên partiyan re dipeyivî bi riya telefonê, ji bo yekrêziya gelê Kurd nemaze di van kawdanên ku gelê me tê re derbas dibû herdem digot: **divê em rêzê xwe bikin yek çiqas nakokî hebin, ji ber ku doza Kurdî ji nakokiyên kesayetî û partîtî mestir e, nakokiyên xwe bidne alî ji ber ku îro ye roja Kurdîtiyê, divê em Kurd vê derfetê ji destxwe nebin .**
Her weha jî gotiye :

Di vî serdemî de
Her Kurdek divê welatê xwe binase
Her Kurdek divê dîroka xwe bizane
Her Kurdek divê zimanê xwe bizane
Her Kurdek divê berevanê welatê xwe be.
Hingê em ê rizgar û azad bibin

Di roja yekşemê 6.11.2011an de, yekemîn roja cejna qurbanê demjimêr 6:20 êvarî jî nav me bar kir di roja 7.11.2011an de di rêwrismekî şayiste de demjimêr 10:15 sibehê ber bi bajarê Dêrikê ve birêket ew bajarê ku evîndarê wê bû bi amadebûna rewşenbîr, partiyên siyasî şêx û kesayetiyê deverê bi hezaran kes ji devdra Qamişlo, Çil Axa, Girkê Legê, devera Koçera, Herêma Dêrikê tevlî rêwresmê sipartina wî bo axa welatê wî bûn. Hozanvanê mezin Emerê Le'lê bû yê ku zêdeyî pênci salî kar û xebat kirî ji bo doza xweya dadmend di warê tore û siyaset û civakê de ji ber ku miletê me wefadare nerx û bihayê hozanvan û nivîskar û tekoşerê xwe dizanin ji lewra bi ahengekî şayiste de, bi gotin û helbest li ser gora wî hatin xwendin di goristana Dêrikê de hate hembêzkirin bi xakê hate sipartin. Û bi hezarn kes hemwelatiyên Rojavayê Kurdistanê beşdarî behiya Emerê Le'lê bûn, û di behiya wî de jî Peyama Bêroya Serokê Herêma Kurdistanê Birêz Mes'ûd Barzanî hat xwendin, û sersaxî ji gelê Kurd û malbata helbestan Emerê Le'lê re xwest.
Di roja 16.12. 2011an de kombenda nivîkarên Kurd li bajarê Dêrikê çilrojiya hozanvanê xwe lidar xistin li pêşiya mala birayê wî gelek nivîskar û helbestvan tê de beşdar bûn ji Hisiça, Qamişlo ,Serê kaniyê ,Amûdê û Dêrikê di gel miletê Dêrikê û deverê yê wefadar Şayisteyê cihê hozanvan bû, di civaka wî de
Di roja 18.12.2011 Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Dihokê ahingek li dihokê di çilrojiya wî lidar xistin bi beşdarbûna nivîskar û helbestvanê Dihok û Zaxo û hin ji devera Dêrikê jî tê de beşdar bûn, di vê ahengê de rola hozanvan di warê tore û siyasetê hate nerxandin û dîwana wî ya pênca hate çapkirin ji layê Yekîtiya Nivîskarên Kurd ve û belavkirin li ser amadebûyan bi vî awayî jiyana hozanvanekî mezin bi dawî bû ku li seranserê Kurdistanê hatibû naskirin.

**Gera Welat**

Rê bi rê diçûm ber û van çiya
Av û çol û co lat û geliya
Xakî şîne dar zevî û beyar
Ew avên tezî tê j,bin keviya
Bi ken û xweşî di nav re bezîm
Ketim gumana ji ber hilweşîm
Ev deşt û zinar tev gund û bajar
Bakim dost û yar ji bo ser ejîm
Deşt û zinarêm deryayê neftê
Hawîrdorê min dijmin bi lez tê
Ev miletê jar nizanê b,neyar
Şiyarbûm ji nû nema me xew tê
Dijminê xwînxwar bi zor me dixwî
Bi bang û hewar wa xortên sexî
Bi top û tifeng bi halan û ceng
Dijmin derkevî ji her çar rexî
Milet şyiar bû bi kar û xebat
Mal û can didê bi gorî welat
Rêncber û şivan di gel xwendevan
Mizgînî me da vaye roj hilat
Dijmin serşorî j,welat derkevî
Sîtem me dixwî b,sîtem derkevî
Navêm kar bi zor navim navim ceng
Aştîxwaz im em divên wek hevî
Roja azadî nêzîk e ne dûr
Çeka hilgirin li jêr hin li jor
Bi tîp û leşker tifeng û xencer
Dijmin derkevî alê hildin jor
18.1.1972

**Welat Binase**

Divê her Kurdek welat binasê
Cihên çep û cûr deverên asê
Çi li Tirka bî çi li Îranê
Çi li Êraqê Sûrya tê nasê
Dema dibêjin Kurd û Kurdistan
Em ji du peyvan didin xeberdan
Yek navê Kurde ya dî sitane
Dibê Kurdistan em dikin basê
Wek em dibêjin navê gulistan
Yan jî dibêjin navê daristan
Cihê gulane cihê darane
Du peyvên hevgir xwe didin nasî
Welat binase bi xîzka tanî
Li derya sipî qefa bêlanî
Eskinderonê ber û jor banî
Ber bi çiya ve ta Amenosê
J,Amanos diçê şarê Osmanî
Bajarê Mereş li çiyayê banî
Çiyayê Armodax bimbok dizanî
Qeyabebere dighê Sêwasê
Ber bi tuqat re diçê demrozê
Sodê û Berkelê em dikin dozê
Hesar şban kar girason l, rêzin
Aloc beleban çiyayên asê
Ji Gûmoşxanê ta Enedolê
Ber bi Bakur ve l,çiyayê Dolê
Çiyayê Xanot heya Çîmilê
Ji wir tê badan wek keva dasê
Ji çiyayê Hemşin ta Ertewênê
Mercord xanûqat heya Hopanê
Li Batom diçê keva derya Reş
Sînor Gurcistan devera asê
Diçê ahiska bakur ber bijêr
Rojhilat xenaq heya Çaledêr
Erpiça veger ta Bayezîdê
Li Rojhilatê bajarê Qersê
Derbasî Mako li nav Eyranê
Li Zengemarê ta Hemedanê
Ber û Sotanê Abad Merecord
Lor û Xozistan sînorê Firsê

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress
buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe...Bi Zelalî

# Keça Êzidî: Buhayê Min 8 Dolar Bû

Cînan keçeke ciwan a êzidî ku ji destê grûpa Dewleta Îslamî (DAÎŞ)ê reviya, pirtûkek bi nave "Dîla DAÎŞ"ê li Fransayê weşandiye.

Ev pirtûk bi hevkariya peyamnêrê rojnameya Figaro yê Thierry Oberlé hatiye nivîsandin.

Cînan piştî dîlbûnê di yekem êrişa çekdarên grûpa Dewleta Îslamî (DAÎŞ)ê bo Başûrê Kurdistanê, demekê ji aliyê vê grûpê bo herêmên cuda hate veguhestin û di dawiyê de ji aliyê du zilaman ve (melayek û polîsekê) ve hate kirîn. Li gor maleprên Gransî, Cînanê gotiye buhayê min 10 hezar dînarê Îraqî bûn yan 8 dolar bûn.

Keç û jinên êzidî Xirîstiyan li bazarên ku li Îraqê hatine damezirandin weke dîlên cinsî têne firotin.

Ajansên Fransî ku got ûbêjeke dirêj bi Cînana 18 salî çêkiriye, destpêka sala 2014ê li bakurê Îraqê ji aliyê çekdarên DAÎŞê dîl hatibû girtin, lê berî nêzî sê mehan dikarîbû ji destê wan bireve.

## kurdî
### Xweş e

| | |
|---|---|
| Hevkêşî | معادلة |
| Pişkdarî | اشتراك |
| Rencxurî | – |
| delîvedîtin | استغلال |
| Pêlangêrî | تواطؤ |
| Destek | أزلام |
| Bimebest | تعمّد – تقصّد |
| Bêsînor | مطلق |
| Berhevkirin | تأهيل |




# "Werza Kergedan" Li Sînemayên Brazîlê Ye



Filmê sînemayî yê " Demsala Kergedan- Rhino Season" ya bi derhêneriya sînemakarê Kurd, Behmen Qubadî di 29 sînemayên Brazîlê li ser perdeyên sînemayê ye û sê mehan dê bê nîşandan.

" Demsala Kergedan" ku berhema dawiya bilinda sînemakarê Kurd Behmen Qubadî ye, piştî nîşandana li sînemayên welatên cîhanê û beşdariya di festîvalên navnetewî de û bidestxistina çend xelatên cîhanî, ji aliyê kompaniya " İmovisin" a Brazîlî di 29 sînemayên bajêrên São Paulo û Rio de Janeiro çû ser perdeya sînemayan. Nûçe, raport û rexneyên sînemayî yên wî filmî di dezgehên ragehandina wî welatî de dengvedaneke zêde hebû.

Kompanya " İmovision" a Brazîlî di raportekê de ragehand: " Demsala Kergedan" bi başî hatiye pêşwazîkirin û di rojname û kovaran de gelek babet û rexneyên pozetîv li ser hatine nivîsandin".

# Peyva wendayî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | Ş | V | A | N | C | A | P |
| 2 | B | O | N | A | M | A | V | O |
| 3 | D | I | L | O | P | R | P | Ş |
| 4 | E | B | A | N | N | A | O | M |
| 5 | B | O | N | A | Ê | A | L | A |
| 6 | E | B | I | D | R | T | I | N |
| 7 | G | I | L | O | K | U | D | R |
| 8 | K | Ê | R | Ê | X | R | E | B |

Aşvan tu cara nabe poşman. Berxê nêr bona kêr. Av dilop dilop dibe gilok.

Peyva wendayî: Ji 3 tîpan: Lawirekî jehirdar e.

## Hejmara bûrî

**Tembûr**

# Xaçerêz

## ASOYÎ

1.Paşnavê zimanzanekî kurd.
2.Baranê tînin, ducanî.
3.Cih (vajî), cot.
4.Wekhev, navê çemekî.
5.Sûreteke Qurana pîroz ku li ser miriyan dixwînin.
6.Wekhev, bingeh.
7.Tirimbêl.
8.Navekî keçan, tev (vajî).

## STÛNÎ

1.Liv.
2.Cînava kesê sisiyê, çûna bi lez.
3.Wekhev, damar.
4.Tiştê piştî paleyiyê tê danhev.
5.Diktatorê Iraqê (vajî), bûyerek di dema bûrî de.
6.Vexwarina sereke, xwarineke kurdî havînî ye.
7.Feqîrî.
8.Cureyeke şînahî tûj û şêrîn in, 30 roj.

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | |
| 3 | | ■ | | | | ■ | | |
| 4 | | | ■ | | | | | |
| 5 | | ■ | | | | | | ■ |
| 6 | | | ■ | | ■ | | | |
| 7 | ■ | | | | | | ■ | |
| 8 | | | | ■ | | | | |

## Hejmara bûrî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Ç | A | L | D | Ê | R | A | N |
| 2 | E | F | S | A | N | E | ■ | Î |
| 3 | R | R | ■ | W | E | Z | Î | R |
| 4 | M | Ê | K | ■ | D | A | R | A |
| 5 | ■ | N | O | T | E | ■ | P | ■ |
| 6 | N | E | V | Î | ■ | D | E | M |
| 7 | A | R | A | M | Î | ■ | H | Ê |